



kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn




hejmar 67 | 2017



<http://apecpublishing.com>




GRANIAS TĀRAR



Weşanxaneya APECê



**Tüm zamanların en etkili
100 fotoğrafında 'KÜRTLER'**



Şer, kûştîn, Penaberî,
WÊRANKARÎ

û

dîjmîntîya Kurdan...

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 67 | 2017

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Dr. Mikaili, Xizan Şilan, Nuh Ateş, Mem
Xelikan, Hesen Huseyin Deniz, Rohat Alakom, Yalcin

Polat, Yusuf Yeşilöz, Muzaffer Özgür, Uskê Cimik, Seyfi

Doğan, Fatoş Koyuncuer, Dr. Sozdar Midî (E. Xelil),

Yusuf Polat

Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08,

Spånga/Sverige

E-post

info@apectryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Têkili/Îlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa:

Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İşveç hesap numarası: (Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İşveç dışındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baskı: Apec- Tryck AB



17/12

Roja ala Kurdistanê li seranserê dunê hat pîroz kirin

Wêneyê berg: ji firca Lukman Ahmad

Azadi (freedom 48x36-acrylic-on-canvas.2012)

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tèn,
serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan
nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

- Ji bîrnebûnê 6
Alî Çiftçi
- Kurd-Der a Ankarayê hat girtin 8
Mem Xelîkan
- Komkurd - An hat girtin 9
Muzaffer Özgür
- PKAN-E û Komisyona Jinên Kurd a Bala li
ser koçberî û dîroka surgûnê konferans çekir 10
Dr. Mikailî
- Kurdên Balayê hatin ba hev 11
Muzaffer Özgür
- Mirina Hûco 13
Muzaffer Özgür
- Wêne 16
Seyfi Doğan
- Vira Stanbol e 17
Yusuf Yeşilöz
- Zewa Milê Hûsîn 20
Uskê Cimik
- Koçberî 33
Seyfi Doğan
- Ala Kurdistan 24
Seyfi Doğan
- Bes e were 26
Mem Xelîkan
- 27 Sîyarê Têrika -10
Dr. Mikailî
- 33 Pêkenî - Serhatî
Nuh Ateş
- 36 Garika ji bên
Fatoş Koyuncuer
- 37 Şopên dema xatirxwastinê -VII
Nuhê Hecî Malê Herşid
- 40 Di romana swêdî de koçberiya
kurdan
Rohat Alakom
- 55 Kîlam
Yalcin Polat
- 58 Bayê baweriyê
Xizan Şilan
- 60 Mele Ehmedê Paloyî
Yusuf Polat
- 65 Bermekiyên kurd
Dr. Sozdar Midî (E. Xelîl)
- 69 Hunermendekî kurd, Lukman
Ahmad
Alî Çiftçi
- 70 Demên borî
H. Hüseyin Deniz

Ji bîrnebûnê

Xwendevanên birêz, bi hêvîya saleka aram destpêka 2017an li we pîroz be!

Sala borî li hemû cîhanê û bi taybetî jî li welatê me bi bûyerên lez û bez ên nexweş derbas bû. Li her çar aliyê welêt dîsan şer, kuştin, girtin, malwêranî, derbederbûyî û xizanî bû para xelkê me!

Hêvî û destkeftiyên ev salên dawî dewletên dagirker pir tirsandin û wan ev pêşketinên civakî û çandî ku li nav xelkê kurd de zîl dabû tahamûl nekirin, bi hezar dekûdolaban ev aramîya ku hebû têk birin!..

Li bakurê welêt û Tirkîyê, dewletê bi navê OHAL (Rewşa Averte) ku piştî hewldana derbeya leşkerî ya 15ê havîna pêşîn a 2016an rûda, dest da ser hemû şaredariyên bajarên kurdan û bi awayekî faşîzan û îşgalkaran şaredar girtin, heps kirin. Ev jî têr nekir gelek televîzyon, rojname, kovar, malper, dibistanên zarokan, komele û sazîyên sîvîl ên çandî û demokrat ku xebatên kurdî dimeşandin hatin girtin. Di nav van de Enstîtuya Kurdî ku 24 sal in li ser ziman, wêje, dîrok û çanda kurdî xebatên heja kirine û kovar û kitêbên dîrokî, wêjeyî, çandî weşandine jî tê da, komeleya KOMKURD-AN a Ankarayê jî ji bo sê mehan hate muhurkirin û hemû

xebatên wê hatine sekinandin. Vê komelê hê saleka xwe tîje nekiribû. KOMKURD-ANê bi dehan xebatên bo nasname, pêşxistin û parastina çand û zimanê kurdî her meh semîner û gotobêjên balkêş organîze dikir û bibû navendeka kurdên Anatoliyayê.

Girtina rojname, televîzyon, radyo, enstîtû, kovar, komelên sîvîl helbet zerareka mezin dide fikrê azad û demokrasîyê. Lê, divê ev xebatên sîvîl ên kurdî herçiqas komele û sazi bînin girtin jî, berdeyam bin. Li hember asîmîlasyonê divê her kurdek mala xwe bike dibistanek û bi zimanê xwe deng bike, xebatên lêkolîni yê ferhengî, ziman û çandî pêsta bibe.

Dewletê berê xwe daye hemû hêzên demokrat û layîk ku ne wek wan difikirin. Rê li hêzên pašverû, îslamî û nijadperestên tirk re vekiriye. Vê rewşê jî dubendî û sêbendî di nav ciwatê de çêkiriye.

Em hêvî dikin hêzên sîvîl, demokrat û ronakbîr li hember ev kirinên dewletê bêdeng nemînin, dengên xwe bilind bikin û xwedî li fikrê azad derkevin.

Nivîsên folklorîk, bîranîn, wêjeyî û lêkolînî

Muzaffer Özgür bîranîneka xwe bi sernivîsa *Mirina Hûco* nivîsiye. Hû-

co li piraniya gundên kurda bi zirna xwe dihat naskirin. Ji ber di her dawet û şahiyekê da bi lêxistina zirneya xwe deng dabû. Muzaffer bi vê bîranînê hem Hûco bi bîr tîne û hem jî girîngiya hunera zirnelêxistina wî ku xizmeteka giranbuha kiriye bo çand û folklorê kurdî bi wêneyên dîrokî diparêze.

Yusuf Yeşilöz bi sernivîsa *Vira Stenbol e* bîranîneka xwe ya sala 1976an dema cara yekem çûye Stenbolê nivîsiye. Wan salana hê jî kurdên me yên Anatoliyayê berxên xwe dibirin, li Stenbolê difrotin. Wexta bavê Yusuf bo firotina berxa tere Stenbolê Yusuf jî pê ra diçe. Ev serpêhatiya wî ya çûyîna Stenbolê ye.

Dîsan bîranînek ji Uskê Cîmîk bi sernivîsa *Xwelî çi ye? Zewa Mîlê Hûsîn* qala barkirina ji gund bo bajaran dike. Koçberî, xerîbî û têkçûyî babetê wê bîranînê ye.

Seyfî Doğan li ser alaya Kurdistanê lêkolîneke dîrokî ya balkêş kiriye. Seyfî dîroka ala Kurdistanê û rengên wê digihîne mîtolojiyê û ola kurda.

Birêz Dr. Mîkaîlî bi rêzenivîsa xwe ya *Sîyarê Têrika* serpêhatiya Osê, ya dehan nivîsiye.

Birêz Nuh Ateş bi sernivîsa *Bayê malê Hemzo û gayên Çelo*, pêkenî-serhatiyek bi zaravayê xelika nivîsiye.

Fatoş Koyuncuer li ser tradîsyoneka berê, dema guhên keçîka qul dikirin kurtenivîsek bi sernivîsa *Garikê ji ben* nivîsiye.

Rohat Alakom bi sernivîsa *Di romana swêdî de koçberiya kurdan* lêkolîneka wêjeyî kiriye. Di sala 2015an de kurdan li Swêdê 50 saliya xwe tije kir. 50 sal bişûnda hêdî kurd û koçberiya kurdan bûye babetên romanên swêdî. Birêz Rohat Alakom wek her karê xwe yê din di wejeya swêdî de jî wek dedektivekî hûr û kûr romanên swêdî lêkolaye.

Yalçın Polat li ser gotina *Kilam* lêkolîye û di encamê de nîşan dide ku peyvya kilam di zimanê me de peyvek esîl kurdî ye.

Birêz Yusuf Polat bi sernivîsa *Başşikestî* Mele Ehmedê Paloyî dide naskirin û helbestên wî şirove dike.

Birêz Dr. Sozdar Midî bi sernivîsa *Bermekiyên kurd di kûraniya dîrokê da* lêkolîneka dîrokî bi zimanê erebî, di kovara li ser înternetê ya bi navê *Pênûsa Nû* de weşandiye. Ji ber girîngiya nivîsê, bi destûra werger Mustefa Reşîd ku ev ji bo xwendevanên kurdî wergerandiye kurmancî, em ê wek rêzenivîs biweşînin.

Heta hejmara 68an bimînin di xêr û xweşiyê de!..

Alî Çiftçî

XEBER

KURD – DER A ANKARAYÊ HATE GIRTIN

Mem Xelîkan

Komeleya Demokraî Çand û Piştewaniya Kurd, di sala 2004an de li Ankarayê hatibû dameziran-din. Kar û xebata wê ya herî girîng, ji ber pişawtinê (asîmilasyon) xwe parastin bû. Komelê, sala 2006an vir de ji bo fêrbûna zimanê kurdî, gelek xebatên girîng pêkanîn. Bi hezaran xwendevan, bi sedan mamoste yê zimanê kurdî gihandin. Li ber pişawtinê, wek mertalekê sekinî.

Di roja 30.10. 2016 de, Kurd-Derê komcivîna xwe ya 7an a asayî pêkanî. Lê mixabin, di roja



11.11.2016an de ji aliyê parêzgerê (valî) Ankarayê ve kar û xebatên Kurd-Derê, bi sê mehan hatin sekinandin, deriyê komelê mohr kirin û girtin.

Wek hûn jî dizanin, bi ser bûyera 15ê tirmexê ve li Tirkîyê OHAL (Rewşa Awerte) hat êlan kirin. Û bîryar hat dayîn ku, 370 komel û sazî bên girtin. Ji wan komel û sazîyan, 190 sazîyên kurda ne.

Tirkîye, di rewşeke xirab de ye. Rojname, TVên demoqrat û yê kurdan hatin girtin û weşandina wan qedexe ye. Gelek sîyasetmedarên kurd, hatin binçavkirin û hatin girtin. Karmendên kurd, ji pewirê bi dûrxistinê hê jî berdewam e. Her rojekê, bi dehan sîyasetmedar, rojnamevan tene binçavkirin û girtin. Deriyên komel û sazîyên demoqrat tene



Mustafa Karaman (serok)

mohrkirin. Vekîl û rêvaberên HDPê, hevserokên şaredariyên di dest DBP de bêheq têne binçavkirin û berhevkin. Şûna hevserokên şaredariyên bi îradeya gel hatine hilbijartin, bê zagon *keyyum* têne tayînkirin. Ev fereseta dagirkeriyê ye, ne tiştêkî ku were qebûlkininê.

Girtina KURD-DERê, tê wê wata yê ku li dijî rojname, tv, ziman çand û sazîyên kurdî tehemûla dagirkeran tune ye. Pêvajoya ku gelên Tirkîye têda, rewşeke awerte û li dijî demoqrasî û mafên mirovahî ye.




KOMELA KURDÊN ANATOLIYA NAVÎN (KOMKURD-AN) HAT GÎRTIN

Muzaffer Özgür

Sersala 2017an ji bo Kurdên Anatoliya Navîn ên li Ankarayê dijîn bi xemgînî despêkir. Komela Kurdên Anatoliya Navîn (KOMKURD-AN) ji aliyê parêzgerê (valî)

Ankarayê ve kar û xebatên komelê hatin sekinandin.

Devleta Tirk li paytaxta xwe, toleransa demokrasî û bi hev ra jiyane tehemûl nekîr û li gor qanûna Rewşa Awerte (2935 OHAL madde 11, benda o) navenda komela KOMKURD-ANê bi sê mehan mohr kir û xebatên komelê jî hatin sekinandin.



PKAN-E û Komisyona Jinên Kurd a Bala li ser koçberî û dîroka surgûnê konferans çêkir.

Dr. Mîkaîlî

Konferans di roja yekşemê 16. cotmehê 2016 li ser at:10.00, di Navenda Çanda Ehmedê Xanê Dortmund de pêk hat.

Konferans bi taştê û sohbetê destpêkir. Bi vî awayî hevdû naskirin û tevgerî jî çêbû.

Endamê Komîsyona Rêxistinbûyîne PKAN-E Aygûn Akdogan, Platforma Kurdên Anatoliya Navîn da naskirin. Aygûn, di axaftina xwe li hemberê asîmîlasyonê çava xwe biparêzin û li ber xwe bidin.

Konferans ji hêla min de hate dayîn.

Mijara Konferanse bi taybetî li ser koçber û sûrgûnkirina kurdên Heciban û bi gîştî Kurdên Anatoliya Navîn bû. Vexta koçberî û sûrgûnê de, çî zehmetî dîtine û çî bi serî wan de hatî, hate behskirin.

Ji pişt re jî li tesîra asîmîlasyona ku li ser Kurdên Anatoliya Navîn (KAN) û rewşa ku îro em tê danî hate niqaş kirin.



Yek ji tekoşîna li hemberê asîmîlasyonê, parastina çanda xwe û jîyandina zimanê kurdî ye.

Hevalê Maruf jî li ser rewşa Kurdên Bilîkan deng kir.

Encama Konferanse, her kes dikare ji mala xwe de pêşî li asîmîlasyonê bigre.

Platforma Kurdên Anatoliya Navîn-Ewropa ji vir bi şûnda li her welat/ bajar û cihê ku Kurdên Anatoliya Navîn dijîn konferansa bide û KAN agahdar bike.

Kurdên Balayê hatin ba hev

Muzaffer Özgür

Di şeva li bajarê Oberhausen a Almanyayê de kurdên Balayê hatin ba hev. Şev di roja 24.12.2016an da bi rêvaberiya Platforma Kurdên Anatoliya Navîn-Ewropa (PKAN-E) hatibû amadekirin.

PKAN ji avakirina xwe bi şûnda bi armanca „Xwedî li çend û nasnameya xwe derkeve û hemberî asimîlasyonê li ber xwe bide“ çalakiya amade dike. Ev şev jî yek ji wan bû. Em jî wek kovara Bîrnebûnê hatibûn dawetkirin û hevalê me Dr. Fikret Yıldız jî wek axaftvan derket ser dîke.

Şeva Kurdên Balayê da, ji welatên Almanya, Belçîka û Hol-landa 350 kes beşdarbûn. Di destpêkê de berpirsiyarê koma amadekar birêz Aygün Ronî Akdoğan derket ser dîke û armanca şevê bi kurtayî anî ziman.

Parlamentere HDPê yê bajarê Şîrnakê birêz Faysal Sarıyıldız di dengkirina xwe de rewşa Tirkîyê û kurdan a niha da agahdarî dan. Li hemberî zilm û zordariya li ser kurdan hatî kirin û rewşa partiya xwe HDPê jî anî ziman. Ji bo piştgiriye KAN spasîya xwe anî ziman û bi



rexistinbûyîna kurdên Anatoliya Navîn jî pesanda wan kir.

Birêz Dr. Fikret Yıldız di axaftina xwe de behsa jiyandina/ dengkirina zimanê kurdî kir û dîroka koçberiya KAN bi mînakên anî ziman. Bi hejmar û agahdariyan KAN dan nasîn. Li dawiyê jî bo hemberî asimilasyonê derketine çend mînak dan û hînbûn û jiyandina zimanê dayikê pesand.

Bi navê PKAN-E jî birêz Cengiz Binyıl axaftinek kir. Binyıl di axaftina xwe de, behsa rewşa Rojhelata Navîn kir û erîşên li ser bajarên kurdan anîn ziman û erîşên li ser

HDPê hatine kirin rûreş kirin. Ji bo armancên PKAN-E jî got, li hemberî asimilasyonê tekoşerbûn, li nasname û çanda xwe xwedî derketin e. Ji bo avakirina bi hev ra kar kirinê banga kurdên Balayê kir kû beşdarî PKAN-E bibin.

Di bernameya çandî de jî; Diyar, Şemdîn, Îhsan Xelikan, Doğan Biçen, Mehlîwan, Hozan Alan, Kerim Taşkıran, Cengiz Kaya û Cemal Güneş derketin ser dîkê. Beşdaran bi taybetî jî xort û keçikên me bi coşeka mezin heta nivê şevê govend girtin.



MİRINA HÛCO

Muzaffer Özgür

Baş naye bîra min lê bawerim Sala 1986an bû. Rojekê ji bo karekî xwe çûbûm Kuluyê. Wek her demê çûm ba biraderên xwe yên hêja Apo û Mehmet Ali. Li aliyê Kırqavê dûkana wan hebû. Dema min silav da wan, herduya bi hev re gotin;

–Serçava, Mizo! Ma serê te sax be! Min bi tirs û lez pirsî.

–Çima, çirbû? Kî mir? Apo got:

–Hûco yê birayê te mir.

–Na loo! Mala min ê! Zirneya muzîka me bêxûdan ma... Bîranînên min hatin berçavan.

Hevala ji min re çayek anîn. Em rûniştin û me li ser hûner û karê Hûco sohbet kir. Hûco bi zirneya xwe xizmetê hûner û folklorê me kiribû. Dema me li dawetekê an jî li bajêr hevûdu didît me her dem sohbet dikir. Me her dem digot:

–Tu pîrê zirneya kurda yî. Bi gotinên me gelek kefa xwe dihat. Dema arak vedixwar pesna xwe dikir, digot;

–Oxlim, ez bi zirna xwe millî me. Cilên min yên millî hene û li ser dilê min ala me heye. Ez çûme Ewropa. Li Ankarayê ez gelek têm

nasîn. Dema hûnermendên mezin kaseta çêkin, bangî min dikin. Ez terim stûtyo û ji wan re lêdixim. Îzzet Altınmeşe, İbrahim Tatlıses, hevalê min in.

Bi van gotinan em gelek eciz dibûn. Dema kek Hasan digot:

–Hûco, ez ê ala te di q..... te kim. Dev ji alê û ji virra berde!

Em hemû bi hev ra dikenyan. Hûco digot:

–Oxlim ez eşîr im. Malbata me Oxçî ne. Ez bi eslê xwe ji gundê Gordê me. Ne wek we bêsil im. Okçî eşîra gelek mezine. Kalê me ji elezîze hatine li gundê Omê cîh girtine. Li salên dawiyê me barkir hatin Kuluyê.

Di ber çavên min re derbas bû. Hûco bi salan ji me pir mezin bû. Kesekî bejndirej bû. Ji ber belangaziyê û jiyana bi derd û kulan porê li seri spî wek heriyê bûbû. Simbelên xwe wek porê wî gewr bûbûn û heta ber guhên vî dihatin. Pîranî qatî kinca li xwe dikir. Di bin ceketê vî da yêlekê xwe hebû. Di berîka yêlekê xwe de cixara xwe û hestê xwe diparast. Meresên xwe,



Çavkanî: facebook. Li daveteka Gundê Xelika/Gölyazi

poztuj û bêboyax bûn. Carcaran ceketê xwe li xwe nedikir, dida ser milê xwe. Bi bejna mezin dema bi rê de diçû wek mêrxasa bû. Tizbiya xwe ya morîgir jî ji dest nediket. Şewqa xwe ya bi heyşt goşe dida ser serî xwe. Di bin de jî porê xwe her dem şê kiribû.

Apo rabû çû yek çayên din bîne. Dema hat got;

-Meyîte Hûco aninê ber mizgeftê. Li ber qehwexaneyê dibêjin xocê camiyê gotiye; Hûco arak vedixwar nimêja xwe nabe. Ez xocetiya wi nakim.

Ez rabûm çûm ber mizgeftê. Bi rastî kesek jî tunebû. Çend kes ji malbata vî hebûn. Ez çûm cem Aslan, Haydar di hembeza vî de digiriya ev aşt dikir. Min got;

-Ma serê we sax be. Bi kelegirî got;

-Ma heval û dost sax bin. Lê tu dostê me jî tunen. Em nikanin miriyê xwe rakin. Xocê mizgeftê nimêja me nakê. Ma em ne misilman in? Min got;

-Em ê çareyekê bibînin. Em li cem we ne!



Ez çûm cem xoce, li ser pirsê
çend gotine xwe kirin. Ji min re got:

–Kesên arakê vedixwin dijminê
xwedê ne û nimêja wan nabe. Min
got;

–Eger tu peran dixwazî eşkere
bêje, emê bidin te.

Erê negot. Me şer kir. Min hersê
xwe di seri de derxist. Devê xwe
vekir rezîl kir. Ji dîne Îslamê gelek
tişt hîn bûbûm. Xaska min wek xo-
ce nimêj jî bikaniya birêva bibira.
Niha ne hevce bû li ber ew xoceyê
gemar bigeriyama. Min nekanî wî
bînim mizgeftê. Kor poşman vege-
riyam cem malbata Hûco.

Me bi malbate re li hev kir.
Xeber da bavê belangazan serokê
şaredariya Kuluyê Hec Hemît
Talayhan. Serokê şaredariyê bi
alikariya eşîra Hûco helbijartin qe-
zeñç kiribû. Destên xwe li ser wan
re digirt. Bi rastî hema jî hat. Min
jê ra behsa xocê mizgeftê kir. Got;

–Nepirse, ez î heme. Min got;

–Her bijî Kek Hecî.

Li ber mizgeftê kaniya avdestê
hebû. Me avdesta xwe girt. Li pêş li
ser kevirê musela Hûcoyê zirnevan,
li ber wî wek xoce Hec Hemît û li
paş vî jî me 5 kesan nimêja Hûcoyê
zirnevan kir. Dema xoce got, ”Heqê
xwe helal bikin”, me got;

–Ma helal be!

Me tabût hilgirt û ketin rêya me-
zala. Min li dor xwe mêzekir nezîkî
10 kesan hebûn. Hemû ji malbata
Hûco bûn. Di nav de ez tenê dostê
wan bûm. Heta sinemaya Atay jî ez
bi wan re çûm, ketim bin meyîte
Hûco, da ser milên xwe...

Qet kesekî nekanî wek mîna
Hûco destana *qamûşê qul lêxe*. Qet
kesekî nekanî *Yema Hemê*, Qet
kesekî nekanî ziravê *Bûkê* û qet
kesekî nekanî *Tellî Tellîyê* û yên
din mîna Hûco lêxe.

Li Kuluyê Hûco û li Kutluxanê
jî Heydo pîrê zirnevaniya Kurdên
Anatoliya Navîn bûn. Wan hûnera
Kurdistanê li herama me berde-
vam jiyandibûn. Koka hûnera
van ji welatê kalûbavên me bû.
Melodiyên wan ji dîroka kurd û
kurdistanê bûn. Hûnera wan wek
gel koç kiribû di nav tûnebûne de
mabû lê, bi devlemendiya naveroka
xwe jiya bû.

Hîro şûna zirnevaniyê, sazben-
diyê û komên muzîkê girtiyê. Gel û
Hûnera xwe asîmîle dibe. Nizanim
wan çend kes wek şagirt li paş xwe
hîştin? Çend kes niha şûna wan di-
girin?

Rehma Xwedê lê be!



Wêne

Min xwest ku wî wêneyî analîz bikim
lê,
ne tîp hatin ba hevdû
ne peyv bi cîhên xwe razî bûn
ne hevokan, xwe danber barî giran
ne jî havsal* a min têgehişt!

*Havsal; Zihnîn bir şeyi anlama ve kavrama yetisi

Çavkanîya wêne: Înternet

Seyfî Doğan

VÎRA STANBOLÊ*

Yusuf Yeşilöz

Ez kê m çûm Stanbolê. Îro evarê ji mevanên heja re behsa biranîna minê yekemîn a li wî bajarê navdar bikim. Dûra her car wexta ku ez çûm wê metropola mezin li Tenga-va Stanbolê tişteke ecêb ez methel dikirim.

Rewîtiya min a yekemîn ya Stanbolê li havîna sala 1976 bû. Ez danzdeh salî bûm û diçûbûm sinifa yekemîn a dibistana navîn. Wê salê bavê min li piştî zordariya dîya min qebl kirîbû ku ji malbatê re xaniyêkî nû û çatiya wî bi kîremîtên sor çebike. Dîya min li gundêkî nêzik xaniyêkî mînak dîtîbû wexta ku we li wî gundî herî ji bo tevnê boyax dikir. Dîya min dixwast ku xaniyê wê çar odayên xwe û dergehêke xwe ya mezin hebin. We reşahiya xanî bi werisê tevnê xwe pîvan kirîbû û ew werisê sise salan di sandûqa xwe ya ji darê gûzê da weşartîbû. We dixwast ku herdu ode li rojhilatê du pencere wan mezin hebin. Sise sala berî

ku xaniya be çêkirin dîya min çavê ji qumaşê kaşmîrê ku li Halebê bi riya qaçaxî dihat gund, dabû dirûn.

Lê ji bo çêkirina wî xaniyê navdar pir jî pere pêwîst bûn. Bavê min, xwedê rehmeta xwe li bike, ji biharê de heta havîne nezikî sedûheyştê berx ji bo bêsî girtîbû. Di nav wan de berxê mê ji hebûn. Li gund bi piranî digotin ku firotna berxên mê gunehêk mezin e. Cîranekî me ji dîya min re hesab kirîbû ku ew dikare bi berxên nêr wan heywanên mê yê ku ew difroşe di pênc salan de xaniyek bide çêkirin. Lê dîya min pir guh neda ser cîrana xwe ya kîbar û xêrxwaz û ji we re digot: "Ji bo xaniyê di xeyala min de ne serêşîye ku ez bikevim gunehê firotna berxên mê."

Li adara wê salê bavê min rehetî soz dabû min ku ez havîne bi wî re diçim Stanbolê, wexta ku wî berxên bêsî birin firotnê. Kêfê min li cîh, dilşadiya min mezin bû! Hevalê min piştî wê demê ji min

* Ew çirok cara yekem ji bo Mala Edebiyatê li Lenzburg (Îswîçre) bi Elmanî hatiye nivisandin.

çavnebar bûn. Carina ez bi xwe bawer dibûm û xaq dibûm ku min peyvê bi Tirkî mîna yekî Stanbolî bi kar dihanî – wek spikêrê radyoyê meyî transistor. Heta wê salê min qet wêneyên Stanbolê nedîtî bûn. Li gund televîzyon tune bû, rojnamê ji nedihatî gund. Di nîqaşî û fantasî de Stanbol dihat ber çavên min û min bawer dikir ku ew bajara ji gundê meyî bi bist malbata pir kêr mezintir e. Min ji xwe re digot ku ezê li ber kanîya Stanbolê fûtbolbaz Metin Oktay bibînim, di qahwe nezikî kanîyê de bi artêstê bi nav û deng Yilmaz Güney re berdaxêk çay vexwim û artêsta bedew Gülşen Bubikoglu li sîya darê nîşan min bike bi çî awayî nargîle tê vexwarin.

Şixula min a li bêsiya berxan de ne sivik bû: li rojê sê caran bi fiçiyêkî ji dusêd lître av ji kaniya ku sêsed metre dûr bû, bînim axir. Fiçî dikat tûlit kirin, gerandin. Pir caran ji di kanîyê de av dimiçikî û me av ji bîra ku du kîlometre dûr bû tîna. Li Anatoliya Navîn, herema gola xwê tunebûna avê îro ji derd û astengiyêk mezin e. Yekcaran min gilî dikir ku şixula av anîne zehmet e, lê gotina dîya minê hevandî amade bû:

"Tu dixwazî biçî Stanbolê!"

Sedemêk duda ne hewce bû ji bo qîret û serwestbûna min.

Wexta ku dîya min diwestiya nîfir li jinên Stanbolê qalcê gir dikirin û digot, ew ji bo ku goşt xwarina wan jinên sillaxwanê şev û roj kar dike. Hingê jî bersiva bavê min amade bû:

"Lê tu xaniyêk nû dixwazî!"

Bavê min bi xwe bi roj li ser gola xwê kar dikir. Evarê ji merên gund li wî kom dibûn û wî ji wan ra bi serfirazî qala sendîqa DISK a ku bavê min wê salê bibû endam, dikir.

Rojekê sibe, di ber rojhilatê bavê min sise qamyonên marqa MAN anin. Li dor deh mêrê camer, bi hêz û qaflêt nezikî dused berxên ku baş gost girtîbûn avetin ser qasa qamyonên sor. Ajokar ji gundê Omara bûn. Li ser her qasayêkê ser vekirî jî pewîst bû ku yek şivan bi re biçe. Ji bo nexwaşî yan ji dizan. Ajokarên Omarî du şivana kal bi xwe re anî bûn, yên sisêyan ji ez bûm. Bavê min bi xwe kete keleka ajotvana a bi konfor. Rewîtiya heta Stanbolê danzdeh seat ajotin. Îro bi tene ew têye bîra min ku gundên li ser rîya me hêşîn bûn û li wan gundan dar hebûn.

Dema ku em li Stanbolê, li mez-
baha Sütlüce peya bûn me bi dilekî
şikestî dît ku sise berx mirîne.
Şivanê ku xemgîn bû berxên min-
dar avetin jêr û got ku firên kirina
xurt ew heywanên delal kuştina. Ji
nişkê ve, mina ku me banga wan
kirîbû, çar mêrên gir, bi dest û qef-
let derketin hatin. Yekî ji wan kêra
xwe a devdirêj derxist û sêre wan
heywanen ku mirî bûn jêkirin.

Min gotina şivanê kalî ku xeyidû
bû ji Kurdi wergerand Tirkî:

"Ew mindar in. Heywan mirîne.
Ew nayan xwarine!"

Mêrikê bi simbelê pan, kêra wî
xwîn li îşka çira kolanê dibiriqî di
dest da, got:

"Ne mindar e, ehmaq! Vira
Stanbol e. Ma tu li gund î?" Piştî
rawestinêk kin wî bi dengêkî hêdî
domand, "Berxa xwe dilivandin
wexta ku min kêr da ser qirika
wan."

Lê wî bi xwe jî dizanî ku ew ne
rast bû. Bilez wan çar qahramanê
Sütlücê ew sise berxana post kirin,
goşt û post avetin sêr piqaba Skoda
ku li keleka min rawestî bû. Wan

Skoda dehifandin heta ku mator
hewl da. Li gund tê bigota: wan lo-
tik dan xwe û bi lêz wenda bûn. Ji
me re jî rûvî û rix hiştin.

Em gundî mat bûn û me zima-
nê xwe wenda kir. Em li ser kevirê
Xalîçê rûniştin û heta sibe li ava de-
rya bi pêlên asan temaşa kir. Şivanê
oldar heta pişqîna şefaqê dua digo-
tin û ji Xwedê mirad dikir ku ew
gunahê wî bêmimêj bibexşîne.

Ji cihe mezbaxa li Sütlüce bîhna
rixê jê dihat, eynî wek gundê me.
Em pir xeyidîn ku bîhna Stanbolê
wek gundê me ye. Sise rojan bi
şûnda bavê min berxan xwe firotin.
Wî perê xwe li şarekê ya ku ji gund
de bi xwe re anîbû, bi çavvekirî pê-
ça û ew jî li kembera xwe girêda.
Nihayet em bi dolmûşê çûn Sirkeçî
û me li vir kebaba palcanê û loqime
Haci Bekîr xwar.

Ji rêwîtiya mina Stanbolê dîsa
jî ez malava hatim gund: Min cara
yekemîn li vir jinên bi qotpantolon
Bluejeans û qaqlibaz dîtîn. Bi tay-
betî jinên bi qotpantolon di çavên
hevalên minê gund ez namdar ki-
rim.

Xwelî çî ye ?

ZEWA MILÊ HÛSÎN

Uskê Cîmîk

Sala 1981ê malê me barkir bajarê Qonyê ye. Siwê zû, li berbangê me tiştên malê li ser sondiqê komyona sor li serhev cîh kir û em ketin rê.

Pisika min a çav kesik jî di hemîza min da bû.

Em ji Îneviyê, ji Girgîşlê û ji Altinekînê derbas bûn û li tesîsa petrolekî dawestin. Pisika min hîn di hemîza min da bû.

Çî bû nizam, pisika min xwe ji dest min filitand, xwe da rû rê û ji ber çavan com bû. Ez bi girî hecîm. Dayika min got, "megîre yovrum, pisika te diçe mal."

Weng jî bû, du sê hefte ser rêvîna pisika min re derbas bû, ji gund xeberek hat, "pisika we li malê we ye. heywenke! ji siwê heta îvarê mirê-mirê wê bû" digotin.

Em li tesîsa petrolê li ser hêşiniyê runiştin, nanê nîvro me dixwar. Dûva Bavê min û şofêr pufê cixarê kirin. Dayika min serê xwe hêjand, kelêgirî bû, di ber xwe da du sê caran got, "pisika me bilem nehevî" û dest bi şorê kir.

"Sala 1960a li bajarê Samûlê dikana bavî we hebû, li wir tîkar distand û difort. Mistefê Kîskilî bi bavê we va kar dikir. Mistefa ji Cûtîka Heremî bû. Jina wî ji gundî me bû, wê re digotin Zewa Milê Husîn. Zew li 1935a hatibû bajarê Samûlê. Li Sûtlîcê dijîn. Wan wextan li Samûlê bi tenê Malê Uskî Milê hebûn. Wan jî li 1925an hatibûn Samûlê. Dûva ji Malê Hamûlê hen hatin, ji Malê Quduz, ji Malê Emdê hatin. Nêzikî panzdeh bîst malên Xelikan li Samûlê bi cîh bûn.

Zewa Milê jinêke jîr, jinêke serbixwe bû, wê çexê gesapxanêke biçûk dest de bû. Bi tenê ew dikana dişixuland.

Rokê bûm mêvanê Mistefê û Zewê. Ser şîva bû, xaniyê wan min kesrê mina sareyekî bû. Di malê wan de çend kes hebûn nizam lê mer jin keç xort kurik pîrr bûn. Lê hemûyan bi zimanê Tirkî vi hevdu re deng dikirin. Bi tenê Zewê vi min re kurmançî deng dikir. Wextî wê deng dikir minak tu bê ez ê li

Gundê Xelika bûm, zimanê wê wigas zelal, wigas xweş bû.

Salê wê dihat heftêyî. Ji xwarinê şûn va wê jinê heta nivê şevê ji min pirs dikir; "li gund kî mir? kî nexweş ket? kî zewîcî? kê çi kir? li wê Yaylê çi bû? baran heye tûne? zevîyê îsal çing in?"

Hazar pirs ji min pirs dikir, min jî ji re yek bi yek bersiv dida. Min ji re qala dilê keçikan û xortan kir. Qala ker kuçikan jî kir, qala hêştiran, hesp û ereban, qala golê xê jî kir.

Wê şevê dev li min biçikî.

Vê re jî ji herdû çavên wê re estirk yek bi yek dilop dikir.

Wê bi kelêgirî digot, "Ez hîn bûk bûm ji gundê xwe derketim."

Keserek kur kişand. Li pencerêye meskir, çavên xwe li ser deryayê gêrand. "Venegriyam carêke din, tu dizanî Nuro! min hîn di xewnên xwe de va bajarê nedîye. Her şev ez li Xelika me. Li Serê Gir im. Li berîye me, li ber çemê, li ser zinarê avê me, carinan li ber tevnê heta siwê bi dengên kilaman, bi çerokan re me".

Dayîka min kelêgirî bû dîsa, estirkên xwe bi kitanê pajkir.

Min wê re got, "Zewo wegêre gundê xwe". Li min meskir, wê got, "rê dûre Nuro, li xeribîye hesretî derd û kul e. Emê bi vî derdî jî li

van deran bimirin, rokê were emê hevdu bîrbikin. Nuro Nuro! pisika me bilem li van deran nehevî. Min vi xwe re pisikek anîbû, sê ro din şun va com bû, serê xwe heyne çû. Eza çing wegerim? kurik li vir mezin bûn, li vir xwandin, zewîcin, her yek bi mal bû, cîh bûn, êdî ne zimanê, ne hesret e, ne jî Xelika êdî ma ye."

Ro dida hundir. Ez ji xewê rabûm, derbasî odeya ruşkandinê bûm. Kesek tûne bû. Bi tenê li pencereyê a ku li deryayê mezdirik ew jina li ser kursiyê runiştî bû. Li ser masê jî sondigek biçûk hebû, ji tehtinê û der dorên wê jî nexşê bû. Ji camên reng bi rengî çêkirîne, ew dibiriqîya. Ew sondiga bala min kişand. Ew rabû, perdêyên sipî yên gulgulî kişand, pencerê vekir. Dengê qeqlibazan, ji dûrê ve wût wûtê geştîyan, wît wîtê ereban, qîj qîjê însanan pêl pêl li odeyê belav dibûn.

Zewê ez dîm û bangê min kir. Ez li hemberî wê runiştim. Min di ber xwe de digot, "ahaa a dîsa pirsan di rêzeke".

Sondiga ku li ser masê bû ew jevkir, jê şêş heft çikinên biçûk dev girtî derxist û dan ber xwe. Devê çikanan yek bi yek jevdikir. Zewê jê yek da ber min û got, "va xwelîya gund e".

Me gîya vi hevdu re got, "xwelî".

Dayika min got, "êrî di çikina yekêmin de xwelîya sor hebû, çengek xwelî bû".

Şoferê me got, "Nurê, yonî min got qey têda zêrziv hebûn, jê hineke bide te."

Dayika min di ber xwe da kenîya û berdewam kir.

Di her çikinê de çî hebû ji min re yek bi yek qalê kir.

Wê got, "va xwelîye sor e, min ji Serê Gir girt. Va hewşan e, min ew da ber ro hîşk kir û dûva hûr kir kire çikinê. Va tekecan e, va boçêbizina ye, va şîşingê sêz e, va genim e. Va jî yûzerlix e, me carinan mîna morî mircanê li guliyê porê xwe girêdida."

Zewê tiliyên xwe di xwelîyê da, serhev kir, dûva tiliyên xwe li ber pozê xwe gêrand, bîhnkir, paşê pê rûyên xwe da. Minak tu bê kremê di rûyên xwe dida û vê re jî mest dibû. Ew êdî ne li cem min bû, ne li odê ne jî li Samûlê bû.

Ev çû, ji Serê Gir da daket. Deh panzdeh keçikên gupsor, bejin zirav, gulîhûr bûn, di nav fîstanên reng û reng de her yek wek bûkê baranê di nav bablûskê de hawar hawar bûn her yek.

Zewa Milê Husîn 1915 –1994
Li Samûlê çû ser dilovaniya xwe.
Nura Hesî Hemê (Dayîka min)
1935–2009 Li Qonyê çû ser dilovaniya xwe.

Koçberî

koçberî di barîyê min da agira
li çavên te gerîyam
kê dizî hesrete te
xwedîyê şevên dirêj û tarî Mîtra
seferî bû
ez deketim ser kanistanka ku
li kelekê cêmê behîştê ye
min xwest anahit ê bibînim
min li nav avê kitêb dîtî
di min re dest hildan
pêl û pêl berjor diherikîn
li ser pelkên kitêban wêne habûn
bajarên ku bi avê cemên cennetê hatî fetisandî
û bajarên ku bi gulan guvaştî
malan derî li ser piştê
pencerên ku bûna yek baca
û ji ewran bîhne rewsîyê dihat

Seyfi Doğan

Ala Kurdistan

Seyfi Doğan

Al nişana war (welat) nasname û qerekertera însanê ku li wî warî dijin e. Al, yekîtî û hekate gel e. Al aqil û hafiza hevpar a şahîda jîyanê ye.

Hekata ala Kurdistanê gelek kevn e. Bi hezaran salên derbas bûne lê heta roje îro mena û qîymetê xwe wenda nekirîye.

Ala Kurdistanê bi reng û mena rengên xwe, me digîhîne tarix, mitolojî û dînê me.

Kokê ala Kurdistanê û rengên wê, ji dîn û mitolojîya kurdan tê.

Dîn, li gor pêwistîyên sosyal, aborî û cografyê tê guherindin. Lê tevda wenda nabe. Dînê nu ku çiyê dînê kevn digire, li gor ihtiyacên nu xwe li ser dînê kevn ava dike.

Mitolojîya kurdan terî kevn î ku ez dizanim zervanizm e. Ji dura dînê mîtra û ji Mîtra bi şunda dînê mazdaizm (Zerduşt)tê.

Dînê Mitra, dînê rojê bû. Mitra bi xwe roj temsîl dikir. Mazdaizmê, rolê rojê ji di dînê Mitra synkronîze kirîyê. Mazdaizm wek em, ji Zend Avesta û ji gotinên peyxamberê Zerduşt dizanin, dînê aql û zîrekîyê ye.

Ala kurda ya yekem ku em dizanin, wek ku Firdewsî di kitebê xwe

yê bi navî şahnamê da dinivisîne Ala Kawa ye.

Ala Kawa, bi ya min, îlhama xwe ji Mazdaîzme heydine. Al, bi piranî îlhama xwe, ji dîn digrin. Bîngêhîya nasnamê wê wexte dîn bû.

Ji bo yekîtîya xelk, divê sembol hebin. Wê demê hemî sembol hema û hema dînî bûn.

Ji bo ku xelkê, li dijî zordarîya Dehak hîşyar û mobîlîzê bike, Kawa, di ala xwe da sembolên dîn bi kar dine. Aql, diyaloga bi aql û adalet û dewlemendî û jîyaneke refahe bê derd û kul.

Ala Kawa û ala Kurdistan, harmonîya tebîetê û zimanê dîn, mîtolojî û rengan e. Ala Kawa sê rengî bû. Sor, zer û hêşin.

Bi dîtina min, ew hersê reng, li gor sê prênşîbên felsefa Mazdaîzmê hatine hilbijartin.

Ci ne ew prênşîbên Mazdaîzme? Hamata, Hakhata û Hvarşta.

Hamata: fikr, baş werin fikrandin! Rengê wê sor e.

Hakhata: şor, baş werin gotin! Rengê wê zer e.

Hvarsta: kar, baş werin kirin! Rengê wê kesk e.

Wan, hersê prênsibên Mazdaizme wek şexis berambarîyê xwe di Ameşa Spentada (Fêrîştehên Qutsî) hene. Rengê sor, agir e. Navê xwe yî Qutsî, di Avesteda (kitebe Mazdaizmê) Atar a. Atar, Lawê Ahura Mazda ye. Tê wê mane ku agir simbolê tavahîyê felsefa Mazdaizmê ye. Li gor Zerduşt Mazdaizm dîne aqil e û iradêyê azad e.

Rengê sor, Agira. Aşqê xwedê. Sembolê êqil û fikrên xas e.

Beramberîyê sor, di nav Ameşa Spenta da Vohu Manah a–Hamata

Rengê Zer; Roj û tirejên rojêne. Enerjî û zanatîyê. Sembolê zekayê û adaletê. Asa Vahişta.

Beramberîyê zer, di nav Ameşa Spenta da Aşa Vahişta a– Hakhata

Rengê Hêşin; Berket e.

Dewlemendîyê Bahr, cem, gol û okyanusên. Ezman û baran e. Ax herdem heşin e. Nişane zîrekîyê ye.

Beramberîyê hêşin di nav Ameşa Spenta da Ameretat, Armaiti û Huarvatat–Hvarsta

Ala Kurdistanê ku îro tê bi kar anîn, ji ala Kawa henek ferqên xwe ye hene. Lê, bingehîya navarokê, felsefê, reng û mitolojîyê wan wek hev in. Kanê wanan yek e. Ala Kurdîstanê ku îro heye, cara evî li serhildana Agîrîyê xuya dike. Ew al,



Ala Kawa



Ala Kurdistan

ji alîyê rexistina Xoybûn da hatîyê ava kirin. Komara Mehabedê ew al, wek ala Kurdistan qebûl kirî ye.

Ferqe Ala Kawa û Ala Kurdistanê a nuha wek min lo jor jî nivîsand pir tune. Rengên ku di Alê Kawa da habûn, derveyî sipî, di ala Kurdistanê nuha da jî hene. Cîhê zerî ku di ala Kawa de hebû bi rengê sipî guherandine. Rengê zer î ku roj temsîl dikirî raste rast wegerandine wênêyê rojê bi bîst yek tîrêjên. Lê mane xwe yêke. Şunê heşin, keskî cîh girtîyê. Kesk û Heşin wek simbol û mane wek hevdine. Herdû ji bereketê, avê, zindîtîyê firehîyê û dewlemendîyê temsîl dikin.

Rengê sipî, pakîştîyê, azadîyê, aşîyê, bakîreyîyê û bêgunahîyê temsîl dikê.

Çavkanî:

Henrik Samuel Nyberg, *Iranska forntida religion*
Firdevsi, *Şahname*
Internet

BES E WERE

Bi avirên xwe
Çiyan dilerizînî
Tirsî dilê dijmin
Evîna min î
Çima
Bi hesreta xwe min radigerînî
Bendewar im
Rojekê nişkavan
Derkeve were heyran
Bes e were van axana
Stêrk govendê bigerînin li asîmana
Sûrên Amedê digerine
Kew û kevok perşikestî
Venagerine hêlînan
Bes e
Bendewar im
De were heyran
Aştî
Dergûşên çav şîn
Bûkên evîndar
Kevokên bê hêlîn
Bi hêvîyên bîrindar
Çav li rêya te man
Bes e
Nazdarîyê neke
Derkeve were heyran

Mem Xelîkan – 2016

Sîyarê Têrika – 10

Bi zaravayê mikaîliyên Polatliyê

Dr. Mikaîlî

drfyildiz@hotmail.de

Ro û meh derbas diwûn, lê koleyê ku Osman Efendi ji Hec bi xu va anîwûn, tu rehetî nedidan wî, wana. E ku herî zêde seriyê wana diêşand jî Bîlal bû, ew hîn jî bi zincîra va girêdidan. Wî dixwast ji wan bireve. Gund, Êl tim li ser pîya bû ku ewe bireve yan jî xerawiyekê, zirarekê bi yekî di. Atarîs hendû bi qedera xu razî, xembar, bi hesreta welatî xu, lê mecbur, li ba wan dima û bi bêdengîya xu, xizmeta wana dikir. Ji ber ku Hewê rû nedida Osman Efendi, Ew tim li ba Atarîsê dima, vayê jî rike dilî Hêwê hîn pirrtir û girtir dikir. Wê girr li Mêrikî xû girtî wû.

Os her siwê radiwû, diçû xanîyî ku Bîlal tê da bi zincîra girêdayî. Gunê wî pê dihat, lê carikê ew bi xu ra hanîbû. Hendi nedikarî wî bişîne jî. Şîret, nesihet le wî dikiirin, lê bêfeyde! Bîlêl koletî, xulamî qebul nedikir! Os rokê dîsa wek hertim berbanga siwekê rawû, desmiya xu hilgirt, berî ku heri nimeya

siwê, çû sêri li Bîlêl xinî, wî kontrol ki. Ket zik odê, ew der alikî exur bû, tarî û bihna rêxê jê dihat. Li hêlikê naxir û hesp diman, li hêla din jî Bilal bi stûnekî va girêdawûn. Wî çire pêxist, berbi Bîlêl çû, Lê ew nedî, xu xûz kîr, li dorbera nêrî, Na! Bîlal tunne wû. Os şaş û metal ma. Bîlêl stûnê ji darî ku ew bi zincîra pêva hatiwû girêdan, ji şûnê da derxistîwû û reviya wû. Osê dizanî ku ew bi quvvet e, merikî pîrr xurt i, lê ewqas jî tehmîn nedikir. Bi xu xu va got;

–Xadêyo, Xadêyoo! Ezê niha wî li ku biwînim, ew çû ku? Ewê heri ku?

Çû camiyê, nimêya xu kir, dû ra ji cemaatê ra reva Bîlêl got. Di nav eşîrê kesên xort û camêr hema çûn mali xu, şûr û mertale xu li xu kirin, tîr û kewan dan pişta xu û bazdan ser hespa û li çar alî dorberê belaw bûn. Bîlal peya û bi ningî xasê reviya wû, ne dikarî pir bi dûrkevi. Li cem sîyarîya tehjiye neçîrê, awê jî hewûn,

şûna ku Bilal lê mawû, bi wana dan bîhn kirin. Tehjiya bi reveka zû dan dû bîhna Bilêl, sîyarî jî li dû wan hespe xu dan tîzika.

Berhevarê gihiştin gundikê şêxzînîya, li vî gundî nasekî Osman Efendî ê hec hewû, Mehemed Axa, wî jî bi xu ra kolek kirrî wû û anî wû. Bilal û koleyê wî hevudu nasdikirin. Sîyarî çûn ber mala wî, silav dan, paqij û xulam hema meşîyan hespe wana hilgirtin birin sertorbe kirin, avdan. Ew jî dawetî oda axeyî şêxzînîya kirin.

Gavik şûnva mezinê wana Mehemed Axa hat, ew xêratî kir, li hal û wexta wana pirsî, sebaba hatina wan jî. Dû ra xeber şand nav gund ku ka Bilal li wir i, yan na. Gavik şûva Bilal bi koleyî wî va anîn ber wana. Dest û pîye wana bi paş va girtî wûn, Bilal bi çavî tiji hêrs û rik li wana dinêrî, singa wî wek defekê radiwû rûdinişt, ji dêv û poz tûk û grîza wî bi ser simêl û rûyî wî da diherikî. Serbere wî gî bi herri û tozê va arrang bû wû. Berxû dawû ku neyê girtin... Mehemed Axa ji şûna xu da rawû, bi gavên giran berbi wan çû, bi dengê qaling û bilind ser wan da qîrrîya;

–Magî ehmaqno! Bi qedera xu razî bin, xayintiye ji xadan xu ra

nekin, ku bira ew jî li we xadî derkevin! Ji we ra rind bin!

Heryekî bi hemdî xu du şalmaq avêtinê. Şûna şalmaq wî li ser gepê wana ma, gep sor bûn, mîna êr dişewitîya. Mehemed Axa jî merikî girî, xurt bû. Herdu kole bi va lêdanê jî ji şûna xu da leqîyan, lê li erdê neketin. Axê ji meri xu ra bi destî xu got vana biwin.

Dû ra ji sîyarîya ra xarin hat, wana zû bi zû ew xarin û destur xastin, dixastin berî ro here ava, bigêjin gund, nemînin tarîya şevê. Bazdan hespe xu, Bilal jî bi hêspî sîyarîkî va girêdan, ew sîyarî, Bilal peya, zivirîn gund.

Osman Efendi bi hatina wan şa bû, Bilal anin ba wî, Bilal bi zorê li pê dima, devrû yê wî bi toz û xaliya hespa spî biwû, bi tirs li hemberî Osman Efendi dawastî, stûyê xu xar kirîwû, li benda cezakî mezin bû, a normal kuştina wî bû. Kole ku jî xadî xu direvîyan yan jî suctar bûn, dihatin kuştinê. Lê di bin kumî Osê da tiştikî din hewû. Ji mêra ra got;

–Dest û ningî wî vekin!

Ew serbest berdan, got;

–Serçavî wî bişon, herin ji Bilêl ra xarin û vexarinê bînin! Şûn ra Bilêl da.

Bilal bi tirs rûnişt, bixu xu ra jî digot; “Ewê min bikuji, lê xarina dawiyê didi min.”

Gîştika li pişti devru şuştinê bi hevra şiv xarin. Bilal, ew meriye gir û camêr xu di quncikî da li serhev da nûr kirûw, bi çavi tiji tirs, li benda qedera xu wû. Osman Efendi kuxiya, gewriya xu pa kir;

–Bilal, cemaat! Hûn jî dizanin cezaya va sucî te çiyî!

Herkesî sere ber jor û jêr va leqand. Yanê; Erê!

Mirin e! Mirin e!

Denge xu diheziya, rû sor bû wû... Bi destî xu rûye xu mist da, ku ew bi heyecan bû û dixwast xu rehet bike, tim xu war dikir.

–Lê ez bi daxwaza Bilal a azadiyê, serbestbûyîne rêz digrim, ji bo yî vê dixwazim ji vê şunva hendû wî girê nedim! wî bi jineka minasiv va bizewicînim. Ji vê şun va Bilal ê hertim li ba min bi, min biparêzi, yanê paqije minî şexsî bi, di xizmeta mi da bi! Dengê xu qut kir, li Bilêl û gundîya mêzedikir, ka ewê çi bifikirin, çi bersivê bidin?

Bilal hema bazda çû dest û ninge wî paşkirin, digirîya, wek baranê, wek lêh, digirîya... Heyeta wî baxişandî wû, Ew ne dikuştin... Gune xelkê pê hatin, ew jî kelgirî

bûn, lê ji wî ditirsyan jî. Rêza xelkê ji bo ew comerdî û dilferahîya Osman Efendî hin jî zêde bû. Qederê ew kirwû kole, lê dîsa jî nedixwast bimire, ew girî, girîyê şabûna wû. Hendi dizanî ku Xadanî wî xerawiyê wî naxazi û bi wî îna diki, bawer bû. Ji vê şûn va Os li ku, ew li dû wî bû. Wek sîya wî. Osê ew bi keçekeka ji gundi canbegan, ji Qirpoliyê va zewicand, ya ku bixu jî keçika kolekî wû, kole Arif Axa, Arif Axayî Qirpoliyê. Bilal hendi yekî ji malê wû.

Wî Os baş diparast, ku ew diçûn dereka dûr, neditirsya, piştî xu di da Bilêl. Bi vê awayî jî danûstandina xu bi derên dûrva hîn jî berfirehtir kir. Li Bursa, Stenbul, İzmir û heta Entaw û Helebê ticaret dikir. Pîrr devletî bû. Ji boy wê hînike çavtehmkar jê ra digotin; Os sêrbaz i, xeta diki pere!

Bilêl di wexta xûyî vala da, çîne şer, şûrkişandin, tîr û kevan karanîn ra lawî Osê û xorti gund dida. Herî zêde jî bi lawî Osê î çûk, Ehmed va bi hevra wûn. Ehmed ji hesp sîyarbûn û şûr kişandinê pîrr hez dikir. Di lîstika cetîdê da tu kesî bi wî nedikanî. Digotin; Law li xala! Ew li xalî xu yî çû yî, deli Yeho...

HESP EHMED DİKÛJİ


Ehmed, delaliyê Osê, telebe yê Bilal ê şerwanîyê, hespe xu bir ser kaniyê, bi avdi. Gema hêsp bi zenda xu va şidandî wû, pêşta hespe qeşawî kir, dû ra xuz bû ku qeşaxa xu li ber kaniyê bişo, ew li kevrî kaniyê xist ku bira pirç û qilêra di nav da biweşe. Ew çend cara li kêvir xist, hêsp ji vê heznekir, çend cara xu hilavêt, Ehmed ew disa berbi xu va kişand û bi paqijkirina xu devam kir. Le hesp hendû nedisekinî, bi vî dengî qeşaxê ku li kêvir diket, cunni biwû. Hesp li ser ningi paşin rawû pê, hîrriya, Ehmed gem di zendê da, li erdê war da. Hesp bi tirs û xof bi hewleka mezin beziya, Ehmed li du xu kaş dikir, Ehmed nekarî gemê ji zenda xu derxîni, xu jê bifilitîni. Herçik hesp direvya ew li dû xu va kaşdikir, Ehmed diqirîya, qîrrina wî erd û ezman girt, vê jî hesp dîntirin dikir.

Gund gî bi dengî Ehmed û hêsp rawû pê. Mêra, xorta, jina giştika xu diavêtin ber hêsp ku wî bidin rawestandinê, lê nediwû, hesp ji tirsê nedisekinî. Herçik diçû, hat diwû... Ew Qerebalix û qirbara wana hesp hîn jî ji rayê derdixist. Ehmed hendi bê can, li serxu çuyî, li dû hêsp dikişiya.

Bilal di exurda bi heywanên din va meşgul bû, bi dengî, qîrrina gundîya derket derva, ku çi biwîni, Ehmed wek mirî li dû hêsp va dikşi û gundî gî li dû wan, dor wan. Wî hema şûre xu kişand, xu avêt stuyî hêsp û bi şûr bennê gemê birrî. Hesp reviya çû, Ehmed, her derî xu dinav xûn û herriyê da mayî, bê can û bê ruh li ser erdê dirêj bû. Wî çû di ser Ehmed da mêze kir, sere wî da ser juniyî xu, bi destekî jî li nebzê mêzekir, li çava mêzekir. Ehmed ji wan çû wû, ruhe xu da wû. Xuz bû ew ji eniyê paç kir, hîn germ wû. Sere Bilêl ket ber, girî ji çava tol bûn, bi dengekî bilind qirîya;

“Xadêyo! Te çi ji vî sebîyî xast çi!??”

Gundî hema meşyan, Ehmed dan ser pişta xu, birin ber malê Osê. Os li ber malê, di nav hewliyê da li pê, bi çavi bêmane û vala, li wan dinêrî, lê ne li wan li pirr dîr dinêrî, ji wan dîr, ji wan ra derbas diwû û diçû. Ne difikirî, ne dilivî. Çend mêre gund hatin ketin bin baski wî, ew girtin birin hundir, dan rûniştinê. Hew hat xu avêt ser wî, him dikir hawar û him jî digirîya, him porê serî xu dirûçikand û him jî nifir li wî dikirin.



Kitabeya šiira Mirina Lawî Osman Efendi, Ehmed.

–Oso! malneşewitîyo! Te yê çî bikira kole û cariyân va! Tu ket guneyî wana, te ew ji ax û mala wan kir! Mêzekî! mêzekî! Xadê çito bela da me, em ji delalîyî xu kirin! Qeder reşo! Bêbexto! Malvêrano!

Ehmed hin şazdeh salî bû, li paş xu sê bira û xangik hişt, ezew bû. Li dû mirina wî Os ji dunê suhat, tu li rûyî kesî nenêrî. Ji ser Qur,an ê ranewû, dest û ning ji malî dunê kişand. Ji Ehmed ra li ser kevrekî šiirek da nivîsand û ew kitabe bi ser deriyî mala xu va kir, li goristanê jî mezelekî ji kevrî mermer da çêkirinê. Vesiyet kir ku wî û dîya wî li hêla hev bi erdê din.

Bi cariya xu Atarisê va ji, qe tu carik din nehatin ba hev, ji Hewê jî direvya. Ditirsya li çavi wê binêri, ditirsya ku Hew Ehmed ji wî bipirsi. Rokê Hew hat hindê wî got;

–Mêrik! Cariya te Ataris ji ber nexaşiya zirav çû rehmeta Xadê, se-re te xaş bi!

Osê tenê bi çavi tiji keser û xem li wê mêzekir, çend rondik ji çava da rijyan. Ewqas! Got;

–Ji wê ra jî mezelkî çêkin, Xadê guna ef ki!



Kevre gornî Hevanur, Bes Xanim.

Ataris bê şin û bê deng dan erdê, ji dê û bava dût, bi hesreta çiyayên duruzîyan, barî dunêya walîn kir. Osê ji wê ra kî kevrik da çekirinê, le ew kevîr di quncikê camiyê da ma, ji tîrsa Hewê, kedi nediwêrî kêvir biwi bi ser gornê va ki. Piştî mirina Osê û Hewê, ew kevîr kirin zik mezeli Osê.

Osê ban Bilêl kir ew jî azadkir, vesîqa wî a azadkirinê amade kirûw jî, dayê. Bilal digirîya, ne ji bo azadbûyînê, ne ji bo şawûnê. Ji bo yî ku ew bi va mêrî kal va qedera xu, rîya xu ji hevûdu diqetandin. Ew qedera tehl û giran... Osê çend heywan, heştîr û 50 mî jî dan wî.

Lê Bilal û zaro wî, newiyê wî tim bûn dost û hevalê mala Osê. Wan xu wek parçek ji mala wî qebul dikirin. Pîrr neajot, Hew yanê, Havanur Bes Xanîm bi derdî lawî xu Ehmed çû rehma Xadê, çend sal li dû wê jî Os, Osman Efendi rehmeti bû.

Wi hîn di heyatê da wû, him ji bo yî xu, him ji bo yî Hewê kevîre gornê xu anîwûn. Li dû xu du

lawîk, Hamid û Îbiş Şewqî hiştin, Îbiş Şewqî bi keçekî ji eşîra Têrika va zewicî, ji wê du zaro wana bûn, herdu zaro û jina wî keça Bican begê Zeyneb Xanîm bi nexaşiya vizika ketin û mirin.

Li dû wê dîsa li gund, ji mala apanî xu newiya Îsmail Axa, keça Xefê bi Gewrê va zewicî, ji wê lawîkîk xu bû, nave kalî xu, nave Osê, Osman Efendi lê kirin. Îbiş Şewqî û dîya xu Gewr zû mirin, Os li mala xalî xu, Mehî Xefê gir bû.

Hemîd bi keça Eliyî Xefur va zewicî, du lawî xu bûn, Efd û Mist. Herdû jî di herba Cihanê da şehîd ketin, mezela wan jî li Eskişehir Sariçalîyê man. Ji heryekî keçîk sêwi man.

Osê navê kalî xu Osman Efendi girkir, kudand, ocax şên kir, ji wî bera malê Osîkê peyda bû. Bi sedan newiyê wî henî. Li seranserî dunê belaw bûyî...

Ew bera Hecibrama hendû bi navî wî tîn bankirinê, Mala Osîkê...

PÊKENÎ – SERHATÎ

Nuh Ateş
nuhates@web.de

BAYÊ MALÊ HEMZO Û GAYÊN ÇELO

Bayê Çolê (sam) ji axizê başûr/ başûrêrojava da tê. Bayekî pir ne çê ye û zîyankar e. Têdahatî ku pir şên tê, nahîle ku dene bikeve zevîyan. Mala Hemzo li perê gund bûye û Bayê Çolê ji wî perî da dihatîye. Lowma li gund, ji Bayê Çolê ra gotine, Bayê Malê Hemzo. Mala Hemzo bi vê navlêkirinê şa dibûye.

Kes nizane kîngê, lê herhal zemanê ku cotkarî bi ga dihatîye kirin, bûye. Çelo cotkarî dikiriye û bi dêyn cotek gayê xwe sitandîye. Bibêjî çî, vêtalabûnî ye, du sala li ser hev Bayê Malê Hemzo pir şên hatiye û zevîyên Çelo jî nerûztine, tu ber nedane. Ji avûrûyê Bayê Malê Hemzo da, Çelo neçar maye ku gayên xwe bifroşe.

Ku rast e yan serhevde ye, kes pê nizane. Li gorê ku tê qalkirin, Çelo rojekê çûye vi derî Malê Hemzo ketîye û ji xwedîyê malê ra wer gotîyê: „Lo Hemzo, ji avûrûyê

bayî we da zevîyên min du sal in ku narûzine. Tu jî pê dizanî min cotek ga bi dêyn sitandîye. Dêyndar ê her ro vi derîyê min dikevîne û ji derîyê min nawine. Wextê ku qala bayî we tê kirin, hun ê pê qirikê xwe heldikşînine, pê xag dibîne. Madem weng e, hîngê qet newe nivê dêynê min tu helne ser xwe!“

Xwedîyê Malê Hemzo lêvegerandîye, gotîye; „Lo Çelo, ev çî şor e, malneketo, ma bayê Xwedê li ser min qeyît kirîye ?! Tu bixwe jî pê dizanî ku zîyana Bayê Çolê gihêste zevîyên min jî !“

Em dirêj nekin, Çelo ji neçarî cotê ga firotiye, kirîye ber dêynê xwe. Her ku Bayê Çolê dihatîye, wî tim û tim lenet lêdikiriye û navê wî jî qet helnedidaye û digotîye, „gayên min ê zik vî bayî da ne, vî cotê gayê sor bi min bi firotin da!“ Wextê ku nas û cîranan digotîne, «Çelo, çima tu navî Bayî Çolê helnadî ! », Wî digotîyê, « helnadim, ez î lê sûvahatime!“

Tiştêkî din jî dikine derîyê Çe-
lo. Goya wî bange mezinê gund
kiriye û gotiye, «warin em herin
Girê Dua û li ber Xwedê bigerin
ku ew pêşîyê li Bayê Malê Hemzo
bigre!» Lê tu kesî guh pêva neki-
riye. Bi ser da xelk, heta ku bi dînê
gund gihê, pê kenîyaye û qirfên
xwe bi Çelo kiriye. Hena digotiye
« mala minê, Çelo î ji rê viderke-
tîye!» Çelo jî ji herdê xwe da, loma
li wan kirine û gotiye, « Magihene
heşkêmeno, duayê baranê dibe, ma
çima duayê bayê nabe! Xwedê î ku
duayê baranê qebûl dike, ê çima
duayê bayê qebûl neke ?! Herin lo
herin, însên xulî mekin, cinên me-

rivan ramekin !» û lixistîye, bi tenê
çûye Girê Dua. Salên ku baran ne-
dibarîye, xelkê gund sewa ku baran
bibara, diçûye Girê Dua, li wê derê
qurban serjêdikiriye û li ber Xwedê
digeriyaye ku baranê bibarîne.

Tê gotin ku ji van qewimîyan bi
şûnda, gundîyan êdin vi Bayê Çolê
ra gotine, „Bayê Çelo“. De tu were,
va navlêkirina qet neçûye xwaşê
Çelo. Wî lome li xwe dikirine û
digotiye ; «Tecelîya min ê neçe ye,
zîyana ku min dîtî pê newû, ji niha
bi şûnda yên ku ji vî bayî zîyan dîtî
ê vi derî min kevin! »

Almanya (Mainz), 09.11.2016

Ji ber ku hen bêje, biwêj, navlêkên di vê nivîsa nêzikî devokê herêmî/cî-
warkî li Anatolîya Navîn da, di Ferhengên li ber destan da cîh negirtine,
min pêwîst dît ku vê Ferhengê amede bikim.

Ferheng : Kurdî– Tirkî

- Axizê: Yan, taraf
- Vêtalabûn: Şansızlık/Bahtsızlık (tala=şans)
- Serhevde: Aleyhte uydurulmuş, bir çeşit iftira
- Têdahatî: Bir çeşid beddua; başına bir derd gelsin anlamında
- Vi dêrî ketin: a) Kapısına varmak/gitmek, b) şikayette bulunmak
amacıyla birisinin kapısına gitmek
- Ji dêrî nebûn: Kapısından gitmemek
- Qirik helkişandin: Onurlanmak

- Xagbûn: Şımarmak,
- Malneketo: Evin yıkılması
- Di zik da bûn: Yüzünden, ...dan dolayı
- Kirin dêrî: Birine mal etmek/ bir şeyi birinin üzerine atmak
- Ji rê vi derketin: a) yoldan sapmak/ çıkmak, b) makul /normal olmayan davranışlarda bulunmak.
- Xulî /Xwelî kirin: Kızdırmak
- Cin rakirin: Cinleri uyandırmak
- Bigihên/pê gihên: Varmak, varıncaya kadar
- Ji herdê xwe da : Kendi tarafından/açısından, kendi kendine
- Magîheno: Hey, ulan : (guman e ku bingeha vê peyvê ev be: Mag,
- Magî, Mog, Mug, Magoî.. bi eslê xwe cureyên navê eşîreke Medan e. Rahîb/revaberê dînê Yezdanî yê ku hingê dinê Medan bû, ji vê eşîrê bûne.)
- Pê bûn/pê kirin: Yetmek, yetinmek

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di **Bîrnebûnê** de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliyê didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlemediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

Garikê ji bân

Fatoş Koyuncuer



Berê li gundan dema ku guhên keçikan qul dikirin, cara yekem li şûna garikan ben dikirin guhên wan. Ew ben yekî ne zêde qalind û ne jî zêde zirav bû. Di qula ku bi derziyê çêdikirin re ew benê 1–2cm dirêj derbas dikirin û girê didan. Yên ku guhên xwe wisa hatine qulkirin pir baş dizanin ku êşa wê gelekî zor e. Di rojê de 3–4 caran ew benê ku bi guhên wan ve hatiye nûsîn, vedikirin û ba dikirin. Her car ji nû ve xwîn dibû û iltihap digirt. Piştî çend hefteyan ew garik derdixistin û garikekê zêrînî dikirin şûnê.

Heman tişt li Ewropa jî heye. Cara yekem garikekê ku alerjî nake dikin guhên zarokan û pişt re diguherin.

Min wek yeka ku guhê xwe wisa bi ben hatiye qulkirin, piştî 20 salan zêdetir keçikekê garik benî li Sêrtê dît û pê pir xenê bûm û êşiyam jî. Ji ber ku êşa ku min jî kişandîbû hat bîra min û loma dilê min bi wê şewitî.

Bêguman ji aliyekî de jî pir kêfxweş dibim ku ew tişt/kevneşopî winda nebûne û hin hene her çiqas yê hêsantir şûna wan girtibe jî.

ŞOPÊN DEMA XATIRXWAZTINÊ

- VII -

Nuhê Hecî Malê Herşîd

nuhates@web.de

Rêwîtiya berve Konstanzê

Di tîranê da, Simo paşepê rûniştibû. Wî piştî xwe dabû hedefa çûyîna Tîranê. Pêçek neçû wî şûn guhêrî û berê xwe berve hedefe çûyîna tîranê kir. Wî heznedikir ku paşepê di tîranê rûne, pê heşên wî diçûn, hundirê wî li hev diket. Xewê li ser wî bû. Şeva çûyî hetanî berbangê ew payî mabû. Ew teve şênahîya xatirxwastinê ya ku bi minesebeta dawilêhatina kursa almanî hatibû çêkirin, bûbû.

Şênahî hate bîra wî. Hîn bihna qelmîskê ya ku wî tê xwe dayibû, jê dihat. Ne tenê ya qelmîska ku wî tê xwe dayî, ya Alenayê jî dagirtbû ser wî. Alena li şênahîya Simo rakiribû dansê. Ew ê Çek bû. Wê demê pir keç û xortên ji welatê Çekoslowakiya, ji şikestina „Bahara Pragê“ şûnda, revîyabûn welatên Awropaya Rojava. Yek ji wan Alena bû. Simo piştbazîya Sovyetê

dikir û li ba wî, alîgirên „Bahara Pragê“ di xizmeta neyarên sîstema sosyalîst da bûn. Lê bîhna qelmîskê diçû xwaşa wî, ya ku, mîna kokteyleke ji parfûm û helmixên wan her duyan lihevxiştî, dagirtibû ser kinc û canê wî. Bi serîyê xwe yê berbi sîng xwarvakirî û bi nefeskişandina ji vir û wê, tê bigota ew î li bermayîyên wê bîhnê digere. Bi fikir û mereman dûrî Alena bû, lê bi hîs û dilkişîyê nêzikî wê bû.

Simo diçû bajarê Konstanzê, ba hevalê xwe, Memo. Ew û Memo hemgundî û hemsalê hevûdu bûn. Zarokatî û xortanîya wan bi hev ra derbas bûbû. Ew hevgerê hev ên ji dilûcan bûn. Pir serhatîyên wan ên şîrîn û tahl bi hevra hebûn. Memo şeşmahekê di ber Simo hatibû Almaniyayê.

„Memo can, kursa min ya zimanê almanî li nêzikî xelas dibe. Eger bi dilê te be jî, ez dix-

wazim bêm ba te û li wir bimêm. Bi bihîstinê ku min bihîstîyê, li Elmanyayê xwendekarên kurd yên kurdperwer û şoreşger ên ku li heqê kurdan digerin, hene. Ma tu kesekî ji wan nas dikî, yan li Konstanzê ji wan kesin hene?“ Simo wer gotibû di nameya xwe ya ku wî, di ber dawîlêhatina kursa zimên, ji Memo ra nivîsandibû da. Mîna ku bibêjî, ew li dermanê nasnameya xwe ya nijadî a ku bi tu tiştî nehesibandî û bi azar û sitemên giran bi dirêjîya salan hatibû û dihate eşandin û li derdkêş û hevrêyên li pêy xeyala sazûmaneke li ser bingeha edlayî, azadîxwazî û bêkedxwarî digerîya. „Keremke bihê, bi hatina te êz ê pir şa bibim. Ew kesên ku tu lê digerî li vî bajarî hene û ez wan ji nêzik da nas dikim. Ez li benda te me!..“ Memo weng cewab dayîbû wî.

Xesletê wî bû, ew li rêwîtiyê û gava bi tenê dima dikete nav xewnerojan. Di bîr û xeyalan da ew derdikete ger û seferan. Niha jî, di vê rêwîtiya dirêj da, di xeyalan da ew geh diçû cîhwarê dêûbavan û der û deştên zarokatî û xortaniya xwe û geh diçû ba Memo û nas û hevalên wî. Bi van çûyîn û hatinên xeyalî şa dibû û pê mat jî dima. Ji xwebixwe ra tim digot, „ma meriv

çava bi şîya dike ku, di xeyalan da bê mesref û zehmet, bi lezûbezeke mîna beza ronîyê, belkî ji wê jî bi leztir, herê cîh û warên dûr û şûnda vegere!“ Li xerîbîyê, wî ji vê jêhatîbûnê pir istifade dikir.

Bi rê da, xem û pirsên bişûnbûna li Kontanzê, bikarditîn û biqezençkirinê ra eleqedar jî di serê wî da çerxdibûn û hewênîya wî direvandin û ew diwestandin. Carcaran nefeseke kur dikişand û berdida, xwe pê fereh dikir. Ji Rêwîtiyeke dirêj şûnda, Simo devdeve êvarê gihêşte Kontanzê. Memo bi çar hevalên xwe va bergihende wî hatibûn û ew bi dilgermî xêrhatî kirin. Gîşt tevhev çûn li xwaringeheke rûniştin. Li wir Simo û hevalên Memo xwe bi hevûdu dan nasandin.

Kontanza hingê, ya destpêka salên heftêyî yên sedsalê rabirtî, bajarekî Almanyayêyî piçûk e, nifusa xwe şeşsedhezhar kes e. Bajarekî li hududê Îswîçrê, li kevîyên gola Bodensee, bi keştîgeh, bi xwezayekê pir xwaş, bi taxên kevn, bi gir û banên bi dar û beran xemilandî û bi kilîmaya xwe ya nermayî xercê ger û geştê ye. Bajareki kevn e, şûn û warê kevnemiletên wekî Kelt/Galet, Aleman û Romiyan e. Bajêr

navê xwe ji navê kesekî malbata qiralê Romayê wergirtiye.

Dora dine rojê, Memo Simo li nava bajêr gerand. Ew li kevîyên gola Bodensee, li navend û şaxên bajêr yê kevn têrî xwe gerîyan û sohbet tîr kirin. Gol bi wî ecêb dihat. Li cîhwarê ku ew lê mezin bûyî gol û derya tunin. Wî ajînî jî nedizanî. Loma gol û derya û çeliqîna ava di zikê wan da hevşkirî ew ditirsand. Lê bitûnî Simo ji vî bajarî hez kir. Ew li ba Memo êwirî. Her du bi hevra di odeyêke mezin ya ku aşxaneyek piçûk, hemam û avdestxaneyêke bi ser va, da diman.

Pir neçû, Simo ji xwe ra karek peyda kir. Di fîrma Telefunkenê da destpê kar kir. Hîngê hîn ihtîyaca

fîrmayên Almanayê bi karkirên xerîb hebû. Dereceyê pêzanîna zimanê almanî di vî karditinê da rolek lîyîstibû. Ji ber ku hingê panzdeh kesên ji Tirkîye di fîrmayê da kar dikirin û gîştan zimanê almanî nedizanin yan pir kêm dizanin. Almanîya Simo li gor wan pir li pêş bû. Di sayê dîplomaya kursa zimên da, fîrmayê Simo hema ragirt. Bi kardîtînê Simo pir şa bibû. Nîhayed ew dibû xwedîyê qezenca xwîya henîyê xwe û ji bigîhanî û midarebûnîya ji brayê xwe xelas dibû. Fîrma ji wî pir xwaş dagerîya bû. Piştî şeş mahekê miqaweleya wî hate dirêjkirin û mahaşa wî jî hate zêde kirin. Fîrmayê dixwest Simo ji bo herdemîyê li ba xwe bigire.

Di romana swêdî de Koçberiya kurdan

Rohat Alakom



Kurd koçberî
Ewrûpê dîkin
(Metro, 19/3
2002)

Sala (2015) kurdan li Swêdê 50 saliya xwe tijî kirin. Ji ber vê bûyerê li Pirtûkxaneya Kurd li Stockholmê çend çalakî hatin pêşkêş kirin. Di van çalakîyan de herwiha kurdên ku pêşiyê hatine Swêdê peyivîn. Ev 50 sal in ji her dever, herêm û beşên Kurdistanê mirov hatine/tên Swêdê. Îro hejmara wan li dora 100 hezarî tên hesabîn. Alan Kurdî, ew zarokê 3 salî ku pêlên Behra Spî

bedena wî a piçûk daqurtand û anî avîte ber reşahiya Rojavaya Tirkîyê bona mirovahiyê bû îbreteke mezin. Angorî agahiyên rojnameyan Alan xwe dabû ser rê û ligel malbata xwe berê xwe dabû welatê Swêdê, lê belê pê re negîhand gava xwe bavêje erdê Swêdê.¹ Piştî vî wêneyî dinya wek tê zanîn rabû ser pêyan, dilê bi milyonan mirov bona Alan lêda! Kurdên Swêdê di da-

¹ Drunknade treåringen Alan var på väg till Sverige, *Dagens Nyheter*, 9/4 2015.

wiyê de serpêhatiya Alan kirin perçeyekî dîroka xwe, dan ser seran ser çavan! Ji salên 1990î vir de Behra Spî jona koçberan, penaber û derbederan bûye goristaneke mezin.

Dîroka kurdên Swêdê her bala min kişandiye. Di derbarê vê mijarê de hin pirtûkên min bi kurdî û swêdî hatin weşandin. Koçberiya kurdan berbi Swêdê herwisa jî gelek şop di warê ziman, edebîyat, film, şano, muzîk, peyker, wêne, fotografi û beşên din ên huner de li pey xwe hîştine/dihêlin. Dema min ev mijara koçberiya kurdan lêkolandiye gelek caran ji der çavkaniyên dîrokî (nivîsk/devkî) bala min herwisa şemitiye ser edebîyata swêdî. Gelo ev koçberiya kurdan a berbi Swêdê di berhemên edebî de çawa cîh girtiye? Kurd çawa di van berhemên hatine nasandin? Bersîvên van pirsan li jêr jî em ê bibînin gelek balkêş in. Vê yekê mirov wek mînak di çend romanên swêdî de baş dibîne. Wêneyê (îmaj) kurdên ku koçberî Swêdê kirine di van romanên de ji sê beşan pêk tê: Demên berî koçberiyê, koçberî û demên piştî koçberiyê. Mirovên bîçare, bêgav şansê xwe careke din diciribînin, qedera xwe teslîmî qaçaxan dikin.

Demekê, carina bi salan li welatên transit wek Yunanîstan, Îtalya û Spaniya dimînin. Heta tîna Swêdê canê wan derdikeve!

Lukas Moodysson bi romana xwe ya otobîyografîk bi navê *Tolv månader i skugga* dixwaze bala xwendevanan bikêşîne ser koçber û penaberên ku difikirin bîna Ewrûpayê. Hevaleke wî ya norweçî jê dixwaze ku di derbarê penaberên bêkesname de teksteke bîngêhî amade bike. Ligel vê hevala xwe di çin paytextê Yunanîstanê, Atînayê ku bona penaberan dergehê Ewrûpayê pêk tîne. Li vir li taxa kurdan rastî kurdekî tîna û navê wî di romanê de wek bi tîpa G derbas dibe. Ev kurda dibe yek ji lehengên romanê. Li serê wî re gelek bûyer derbas bûne. G ji Kurdistana Başûr e, di 12 saliya xwe de koçî Norweçê dike. Li vir tevî hin tawanan dibe. Dema 18 saliya xwe tijî dike, berpîrsên dewletê ji ber van tawanan wî şunda dişînin Iraqê. Berî hatina xwe û dema koçberiyê G rastî gelek bûyerên xemgîn û xirab tê. Bavê xwe wîna dike, diya wî bi kesekî din re mîr dike. Ev zirbavê wî li G dixwe, dixwaze bi kêrê wî bîkuje. Ew careke din ji Iraqê koçî Ewrûpayê dike, li ser Tirkiyê re

xwe dighîne Yunanîstanê û li wir bi hêviya destûra mayîn û karkirinê dijî. G navê Swêdê bîhistiye, dema cara yekem çûye Norweçê, li ser Swêdê re rêwitiya xwe kiriye. Lê belê di hişê G de hertim Swîsre heye, dixwaze rojekê ji rojan here li wir cîwar bibe. G bi norweçî dikare xwe îfade bike. Rewşa penaberên kurd li Yunanîstanê gelek xirab e. Piranî mêr in. Carina malbatek di carina du malbat di odeyekê de dimînin. Rojnamevana norweçî dixwaze taxa kurdan, malên kurdan bibîne û ji G alikariyê dixwaze. Ji ber ku G bi arnawûdên li vê taxê re pevçûye naxwaze bibe rêber. Di dawiya romanê de di navbera vebêjê romanê û lehenga bi navê M de hin tiştên peyivîn. Wek mînak mijara jîyana vî kurdî gelo dikare bibe mijara filmekî tê nîqaş kirin.² Dema tiştêkî wek dengê mûzîka kurdan ji oda nêz tê guhê vebêjê romanê, ew ji xwexwe re dibêje: “*Bifkire G bibe evîndarê M*”.³ Di dawiya romanê de vebêjê romanê dev ji Yunanîstanê berdide û berê xwe dide Swêdê. Hevala wî M li Atînayê dimîne, şîreta li wê dike bona neçe Igoumenitsa: “*Lê belê em herdu*

jî dizanin ku ew ê here wir. Ew ê îşev erebeyekê kirê bike. Ew ê hemû şevê erebeyê bajo, berbi bakûrê. Heta sînorê Arnavûdê, G li kêlekê”.⁴ Di romanê de nivîskar balê dikêşîne alîyekî kurdan ê baş, kurd hev nas bikin nekin dema dikevin tengasiyê alîkariya hev dikin.

Romana Henning Mankell a bi navê *Tea-Bag* ji gelek aliyan de romaneke balkêş e. Di romanê de jiyana penaberan û koçberan heye. Di kampeke spanyolî de bi hezaran kes bi hêviya bidestxistina mafê mayînê û karkirinê dijîn. Ji her neteweyekî kes hatine vê kampê. Qaydeyekî vê kampê heye: Divê herkes navê xwe yê rastî û navê welatê xwe veşêre, tu car diyar neke, hertim navên nû îcat bike. Carekê xeberek di kampê de belav dibe ku Fransa dixwaze hin kesên kurd wek penaber qebûl bike û mafê starbûnê bide wan. Rojekê dema îfadeyên wan tînin girtin, hemû dikevine rêzê. Di nav van de keçeke dev bi ken a reşik ji Nijeriya yê ji heye, ew jî xwe wek kurd nîşan dide. Ew dikeve dilqê kurdan û rola kurd dilîze. Fernando, ew kesê ku îfadeyên wan hildide, ji vê keçîka

2 Lukas Moodysson, *Tolv månader i skugga*, 2013, rûp.191

3 Lukas Moodysson, *Tolv månader i skugga*, rûp.314.

4 Lukas Moodysson, *Tolv månader i skugga*, rûp.365.

reşik a Afrîkayî hin tiştan dipirse, ew dibêje ku bavê wê ji Afrîkayê ye, dîya wê kurd e. Lê belê Fernando ji nişkê ve fam dike ku ew derewan dike, ew kurd nîne. Wî, kurdên wisa reşik qet nedîtine. Di vê beşê romanê de bi dûr û dirêj li ser kurdan û rewşa kurdan tê sekinîn. Ken û girî di vê beşê romanê de tevlihev dibe. Dema jê dipirsin navê te çi ye? Çavên wê li çaya li ber Fernando dikeve û dibêje “Navê min Tea-Bag e”. Ji ber vê yekê jî navê romanê Tea-Bag hatiye dayîn. Paşê ev keçika lêv bi ken tê Swêdê, ew li vir jî navê xwe û zanava xwe hertim vedişêre. Tea-Bag li Swêdê xwe gelek tenê dihesibîne. Vê carê jî tiştine din dibêje. Di romanê de babeta *zanavên deynkirî* (lânade identiteter) cîhekî fireh digre.⁵

Di romana Ernst Brunner *Passionata* de jîyana malbateke kurd-swêdî heye. Lehenga jinîn Cora ligel doxtorekî havaltiyê dike. Dema mirov tê nivê romanê xwendevan fêr dibe ku bavê Corayê kesekî kurd e, navê wî Îdris e. Piştî ku ew dizewice êdî wek Îdris Olivier tê nasîn. Ji Kurdistana Tirkîyê ye. Li Parîsê hunera şanogeriye

xwendiyê. Paşê hatiye Swêdê. Li taxeke Stockholmê Rissneyê di loqinteyêke bi navê Îsfehan de rastî dîya Corayê tê û dizewicin. Bûyerên ku di romanê de hene li Stockholmê derbas dibin. Roman di rûpelekî hundur de wek romaneke Stockholmê (En stockholmsroman) hatiye nasandin.⁶ Paşê çar zarokên malbatê çêdibin. Serpêhatiya Îdrîs balkêş e. Ji aliyê hevalên xwe de wek caş tê tawanbar kirin, ji aliyê Saziya Koçberan de wek terorîst hatiye morkirin. Bona vê jî biryarê şandina derwelatiyê hatiye girtin. Ji ber vê, şopa xwe winda dike, dikeve binê erdê. Di romanê de kesekî wek eyloyekî bêbask tê nasandin (Han var en örn utan vingar). Wî gotiyê ku her kesê bêwelat wek teyrê bêbask e.⁷ Tirkan birayekî wî jî kuştiye. Jina wî Birgit Hellman di loqinteyekê de ji xwe re karekî dibîne. Vê carê xweyê loqinteyê Tomas Blot li dora Birgitê tê diçe, neheqiyê li wê dike. Çawa em dibînin rewşa malbatê ji her alî de berbi nebaşiyê diçe. Di sala 1977an de rojekê xeberek tê ku çar kes ji malbatê ji ber gaza jehrê can dane, tenê keça malê ya

5 Henning Mankell, *Tea-Bag*, Leopard, 2001, rûp.9-10.

6 Ernst Brunner, *Passionata*, 1994, rûp.137.

7 Ernst Brunner, *Passionata*, rûp.193.

mezin Cora xelas bûye. Îdrîs Olivier li paş xwe nameyek jî hiştîye. Di nameye xwe de dîyar dike ku ew kesekî xayîn nîne, wek pêşmerge bi salan tekoşîn daye, kar kiriye.⁸ 15 sal piştî mirina dê-bav, xwîşk û birayê xwe Cora rojekê rastî Tomas Blot tê ku jê gelek nefret dike. Wî gelek heqaret dê û bavê wê kiriye. Di cîhekî romanê de Cora qala perîşanî û rewşa bavê xwe dike û berê xwe dide Tomas Blot: *”Cîhekî lê bimîne tune bû. Dîsa jî te ew bêîtîbar kir. Kurd kesine bi îffet in. Tu zanî? Ê ew dikarin kesekî bikujin eger kesek dest dirêjî jinên wan bikin”*.⁹ Di romaneke Ernst Brunner a din de serpehatiya bîst kurdan heye ku di salên 1990î de tîkî koma giravên Swêdê ku swêdî havînên xwe li wir derbas dikin. Dema havînan ev bi hezaran girav dibin wek bihuştêkê. Ev kurdan li ser Polonyayê re di nav mercên gelek xirab de canê xwe davêjin girava Stenånga. Cara pêşîn swêdîyek Einar ev kurd dîtine û dixwaze li wan xweyî derkeve. Mirov fam dike ku ew ji Kurdistana Tirkîyê tî.

Di romanê de mirov rastî îfadeya “Tirkên Çîya” (bergturkarna) tê ku tirkan ji bo înkarkirina hebûna kurdan bi kar anîye.¹⁰ Hin swêdî alîkariya kurdan dikin.¹¹ Hatina van kurdan bêguman bala wan swêdiyan dikşîne ku havîna xwe li wir di nav kêfê de derbas dikin. Di romanê de qala govend, stran û klamên kurdan, dengbêjên wan tê kirin. Kurd her carê zêdetir xwe nêzikî swêdiyan dikin, xwe serbest û baş dihesibînin. Vê carê swêdî bala kurdan dikşînin, mereqa wan zêde ye. Êdî roja koçberiya wan hatiye. Bi alîkariya polês ev bîst kurd diçin di kampekê de cîwar dibin heta ku destûra fermî ya mayîna wan derdikeve. Bi van gotinan kurdên koçber rêwî dikin: *“Bîst kurdên dilşa bi geştiyê berbi mal wiha bi lez diçin / Dixwazin di kampê de bijîn û spasîyan dikin bona hemû tiştên xweş”*.¹²

Yek ji wan nivîskarên swêdî ku di romanên xwe de cîh dide kurdan Jan Guillou ye. Di salên 1980yî de çawa tê zanîn rewşa kurdan li Swêdê gelek baş nîn bû. Hin kesên kurd ji

8 Ernst Brunner, *Passionata*, rûp.206.

9 Ernst Brunner, *Passionata*, rûp.226.

10 Ernst Brunner, *Den vilde svensken*, 1997, rûp.74.

11 Ernst Brunner, *Den vilde svensken*, 1997, rûp.82-83.

12 Ernst Brunner, *Den vilde svensken*, rûp.119.

aliyê kurdên din de hatibûn kuştin û kuştina Olof Palme jî avîtibûne ser kurdan. Kurd wek kesine kujer hatibûne nasîn. Polêsê swêdî ji ber van bûyeran şik û gumana xwe ya di derbarê kurdan de zêdetir û tîrtir kiribû. Di dawiyê de derkete holê ku tu têkiliyên kurdan bi kuştina Olof Palme tune ye. Lê belê dîsa jî kurd di medyayê de suçdar û gunekar dihatin nîşandan. Jan Guillou di romana xwe ya bi navê *Den hedervärde mördaren* de qala kurdan dike. Piştî kuştina kesekî leşker, polês li bajarê Uppsalayê hin kurdan dişopîne (teqîb dike) û şikê dibe ser wan.¹³ Angorî polês yek ji wan keçên vî leşkerê ku tê kuştin bi kurdan re têkiliyên wê hebûne. Jan Guillou berî vê romana xwe binivîse, cara pêşîn lêkolîneke polês a di derbarê kurdan de bi dest dixê, wê dixwîne û ji xwe re dike bingeh e. Di vê rapora bi navê *légerîna kurd* (kurdutredning) ji 500 rûpelî pêkhatî de rewşa kurdan a salên berî kuştina Palme 1984-1985 tê analîz kirin. Angorî Jan Guillou, piştî kuştina Olof Palme nêçîra kurdan hate lezandin.

Jan Guillou wek mînak di romaneke xwe cîhekî fireh dide kurdan. Polêsên îstîhbaratê li pey rêça wan kesên ku kovara *Newroz* derdixin, dikeve. Pênc kes tên girtin, di nav wan de Nedîm Demîrbax û Azad Daxdevîren jî hene. Polês wisa pêsta diçe yek ji wan wergêrên li bal wan kar dike, Rizgar Serdest jî digre. Di rûpelekî din de nivîskar dîyar dike ku polês vê carê balteyê xwe kevir xistiye. Divê mirov bi hêza kurdan zêde nelîze. Di nav kurdên Swêdê de gelek kesên navdar hene ku wek nivîskar, hunermend, parlamenter, serokên sazîyên sîvîl û dezgehên din de kar dikin.¹⁴ Yek ji wan kriminologên navdar Leif GW Persson jî di romaneke xwe ya ser mijara kuştina Olof Palme de cîh dide kurdan.¹⁵

Bûyerên wek kuştina Olof Palme (1986) û Fadîme Şahîndal (2002) herwisa bi kurdan re hatin girêdan. Ev herdu mijar di medyayê de gelek belav bûn. Di romana bi navê *Vinnarna* de zarokekî kurd jî aliyê hevalên xwe de wek mînak bi navûnûçika “Mördarkurd” (Kurdê kujer) tê navandin.¹⁶ Ev zarokê

13 Jan Guillou, *Den hedervärde mördaren*, 1990.

14 Jan Guillou, *Fienden inom oss*, 2007, rûp.238.

15 Leif GW Persson, *Faller fritt som i en dröm*, 2008, rûp.208-209.

16 Bobi Sourander, *Vinnarna*, 1993, rûp.24.

kurd ku di Dibistana Kungsholmen dixwîne ji ber van êrişên devkî gelek ber xwe dikeve û diêşe. Gelek caran bi wan re pêvdiçe û bi xemgînî vedigere mala xwe. Dîya wî Dolly gelek caran diçe bal serekê dibistanê gilî û gazinên xwe dike, lê belê kes alîkariya wan nake. Bavê Omer, Eşref jî ne li Swêdê ye ku alîkariya kurê xwe bike. Divê ew bê Swêdê û ji vê pirsgirêkê re çareyekê bibîne.¹⁷

Romana Patrik Lundberg ya bi nav *Gul utanpå* li ser mijara ewledkirinê saz bûye. Di romanê de serpêhatiya xortekî koreyî (ji Koreyê) heye ku bûye ewledê malbateke swêdî. Demek tê ev xorta diçe Koreyê li pey koka xwe dikeve, dixwaze dê û bavê xwe yê rastîn bibîne. Razan ku bi koka xwe kurd e pê re havaltiyê dike. Razan, hevalê wî yê odeyê ye. Di unîversîteyê de beşa “Lêkolînên aşitîyê û dubendiyê” (Fredsoch konflikforskning) dixwîne. Dixwaze du xwendina xwe alîkariya kurdan bike ku ji bo serxwebûnê tekoşîn didin. Çanda Koreyê zêde bala Razan nakşîne. Di wextê xwe yê vala de bi mijara Rohila-

ta Navîn mijûl dibe û birayê xwe yê futbolîstekî profesyonel e û li Danîmarkayê dimîne çat dike. Razanê ku li Rosengårdê mezin bûye, dîyar dike ku bûyîna swêdî ewqas hêsa nîne. Mirov li ser netewiya dê û bavên xwe tê hesibîn. Xortê koreyî angorî Razan xwe ewqas emîn nahesibîne. Dê û bavên Razan ji Kurdistana Iraqê ne, eynî zimanî dipeyivîn û çandeke wan a hevbeş heye. Kore ji bo vî koreyî di nexşeyan de tenê xalek (prick) e. Di dawiyê de xortê koreyî wiha dibêje: “*Ez Razan fam dikim. Di esasê xwe de em xweyê eynî pirsgirêkê ne, xweyê “Welatên di hişta çêkirî” (Imaginära hemländer). Em ê hertim bi koka xwe ya genetîk re bîn girêdan. Bi çavên kesên din em tu wext sedî sed nabin swêdî. Cudatiya di navbera min û Razan de ew e ku Razan xwe wek kurd-swêdî dihesibîne, ez xwe wek swêdî*”.¹⁸ Razan û xortê koreyî her çiqas di eynî odeyê de dimînin jî zêde hev nabînin. Carina bi hevra ne li ser futbolê dipeyivîn. Xortê koreyî hin caran dibîne ku Razan û keçekê rûs bi hev şadibin.¹⁹

Piraniya bûyerên romana bi navê *David Puma och Drottning Silvia* li

17 Bobi Sourander, *Vinnarna*, rûp.28.

18 Patrik Lundberg, *Gul utanpå*, 2013, rûp.51-52.

19 Patrik Lundberg, *Gul utanpå*, rûp.74.

taxa Rinkeby derbas dibin. Ji her kom, gel û neteweyan kes li vê taxa biyaniyan dijin. Ji sedî zêdetir ziman tèn peyivîn. Hejmara swêdiyan gelek kême. Ev romana wek nameyeke dirêj dikare bê hesabîn ku lehengê romanê *David Puma* ji qiralçeya Swêdê Silvia re dişîne. Ester ji wek dayîka Silviyê ji Brezîlyayê tê. Yekî swêdî bi Esterê re dizewice, wê tîne Swêdê û ji vê zewacê zarokêk çêdibe. Di romanê de navê wî wek David Puma derbas dibe. Paşê David Puma wek muzîsyenêkî navdar tê nasîn. Di beşeke romanê de qala kuştina Fadîmeyê tê kirin ku ji aliyê bavê xwe de hatiye kuştin. Lehengên romanê Ester û kurê wê David Puma ji ber vê bûyerê gelek ber xwe dikevin, diêşin: “*Kujer-bav niha rûreşiyek ji bo hemû kurdên li Swêdê peyda kir*”.²⁰

Nivîskarê swêdî Theodor Kallifatides ku bi koka xwe yunanî ye di beşeke romana xwe ya bi navê *Det sista ljuset* de qala serekekî kurd dike, lê belê navê wî nade. Ev beşê romanê jî li Stockholmê li taxa Rinkeby, taxa biyaniyan derbas dibe.²¹ Angorî nivîskar, ev serekê

kurd bi mercedesa xwa ya reş dixwaze li xeribiyê Kurdistanê xelas û azad bike! Alîgirên xwe li dora xwe û mercedesa xwe berhev dike, tê û diçe, dixwaze bala mirovan bikşîne ser xwe. Theodor Kallifatides bi vê danasîna tîpa serekê kurd dixwaze nîşan bide ku bi vê qelebalixê û şamatayê welat xelas nabin. Nivîskar bi vî serekê kurd û bi taybetî bi zêdebûna serekên kurd kenê xwendvanan tîne. Di hin romanên din de jî Theodor Kallifatides navê kurdan dide û qala wan dike.²²

Di romaneke Jonas Bergman de qala jîyana kurdekî bi navê Saman tê kirin. Saman ji ber hatina cûntaya leşkerî di salên 1970yî de dema pênc salî bûye ligel dê û bavên xwe hatiye Swêdê, Paşê dê û bavên wî dimrin. Wan heta çî ji destê wan hatiye erf-edetên kurdî hînî zarokên xwe kirine. Saman gotineke pêşiyar dubare dike: “*Bi fîncanek qawe mirov çil sal dibe heval*”.²³ Lê belê angorî Saman kurd gelek çaya reş vedixwin. Ew û birayê xwe yê mezin ku li Uppsalayê dimîne dikana titûnê ku ji bavên

20 Björn Ranelid, *David Puma och Drottning Silvia*, 2002, rûp.320-321.

Lukas Moodysson, *Tolv månader i skugga*, rûp.183.

21 Theodor Kallifatides, *Det sista ljuset*, 1995, rûp.119-120.

22 Theodor Kallifatides, *I hennes blick*, 2004.

23 Jonas Bergman, *Scratch*, 2009, rûp.71.

wan maye bi kar tînin. Ciwanên ku bi pereyan lîstikan dilîzin gelek caran diçin dikana Saman û ji dikana wî bilêtan distînin, jîyana xwe bi şansê felekê girê didin.

Romaneke bi navê *En man-Två världar* ku 30 salên serboriya Şiyar pêşkêş dike ji hin aliyan ve başkêş e. Di romanê de navê vî kurdî wek “Shyar Shamdin” derbas dibe. Di zaroktiya xwe de zêdetir mûzîk û nivîsîna helbestan hez dike. Dema mezin dibe xwe wek homoseksuel hîs dike. Ji xwe re heval û nasên mêr dibîne, ligel wan dijî. Malbata wî dixwaze ew bi keçekê re bize-wice û bibe xweyî malbat. Dema Şiyar mezin dibe li ser Berlînê re koçberî Swêdê dike. Li Swêdê tevî şêvên cejna Newrozê dibe ku ji aliyê rêxistineke bi navê *Federasyon* de amade bûye. Pêşiyê Malmö û Lundê dimîne, paşê li Stockholmê li taxa Jordbro cîwar dibe. Di romana ku ji 355 rûpelan pêkhatî de gelek bûyer li serê Şiyar re derbas dibin. Di dawiya romanê de mêrekî swêdî bi navê Hans dibîne û bi wî re bi fermî dizewice. Di romanê de ji bo mêrên homoseksuel peyva kurdî *nêrbaz* hatiye bikaranîn: “*Tê*

gotin çivîk û teyrên ku li ser Musilê re difirin jî nêrbaz in”.²⁴ Nivîskarê romanê di sala 2000an li Haitiyê rastî Şiyar tê. Ew li wir serpêhatiya xwe ji nivîskar re bi kurtî vedibêje. Di dawiyê de jîyana vî kurdî dibe mijara romanekê.

Homoseksualîteya keçeke cîwan bi navê Şîrîn di romana bi navê *Utan titel* a Anna Charlotta Gunnarson de cîh girtiye. Malbata Şîrînê kurd e û li başûra Stockholmê, li taxa Hornstulê dimîne.²⁵ Şîrîn yek ji wan hevalên vebêja romanê ye. Vebêja romanê navê xwe heta dawiya romanê dîyar nake. Di rûpelê 236an de navê xwe dibêje: “*Ez 16 salî me û navê min Jill e*”. Jill û Şîrîn gelek ji hev hez dikin. Car-car navbera wan xirab dibe, lê belê piştî lêborînan têkiliyên wan care-ke din saz dibin. Şîrîn di romanê de keseke rastgo û überfeminist tê nasandin. Keseke wisan e ku astengî, tengasî û sînoran nas nake. Di cîhekî romanê de Jill dîyar dike ku Şîrîn ligel çar keçikan û xortekî têkiliyên cinsî pêk anîye, ew bi xwe ji tu bi kesekê/kesekî re qet ranezaye, gotina *sifir* (0) bi kar tîne.²⁶

Di romaneke Eva Susso de em

24 Odd Odenvind, *En man-Två världar*, 2005, s.45.

25 Anna Charlotta Gunnarson, *Utan titel*, 2012, s.166-167.

26 Anna Charlotta Gunnarson, *Utan titel*, rûp.107.

vê carê keçeke kurd bi navê Kejal dibînin ku li bajarê Västeråsê dimîne, ji piçûktiya xwe heta niha li vî bajarî dijî. Bavê wê di fabrîqeya lempeyan de kar dike. Kurdeke ji Kurdistana Başûr e. Di romanê de dema Kejal dikeve sinîfa xwe, mamosteya wê, Kejalê bi hevalên wê dide nasîn.²⁷ Kejal bi vî tehrî hêdî hêdî nasiya xwe dide gelek heval, ziman û çandên cîhanê.

Romana Moni Nilsson ku di sala 2007an de bi navê *Hoppet* derket li ser jîyana du birayên kurd e. Azad û Tîgrîs bi serê xwe hatine Swêdê û salên bûyîna xwe kêr nîşan dane. Azad birayê piçûk, Tîgrîs yê mezin e. Azad dibe heyranê bilindhilavêjîyê û şampiyona swêdî Kajsa Bergqvist. Azad bi vî hêviyê mezin dibe. Angorî Tîgrîs “*Azad wek çivîkan difire*”.²⁸ Nivîskara romanê Moni Nilsson di destpêka romanê de dinivîse ku wê ev roman bi pêşneyara Rewas Kadir nivisiye. Roman paşê dibe mijara filmê bi eynî navî: *Hoppet* (Hêvî).

Di romana Erik Löfvendahl a bi navê *Min skuld är min* de, di salên 1980yî de

xwendekarek dema di unîversîteyê de beşa edebîyatê dixwîne dest bi nivîsa romaneke dike. Dema romana wî li ber qedandinê ye, ew ji aliyê kujerekî de tê revandin û ev kujera zorê dide nivîskar wekî romana wî binivîse. Lehengê romanê Tord keçeke kurd bi navê Nejma (Nedjma) ku di eynî xaniyê de paqijiyê dike dibîne û dibin heval. Nejma dixwaze bi wî re bizewice. Bav û birayê wê mamoste bûne, ew bi xwe ji Kurdistana Tirkîyê ne: “*Swêd welatekî xweştir e, li Tirkîyê mirov nikare kurdî jî bipeyîve...*”²⁹

Bûyerên çend romanên ku qala kurdan dikin li bajarê Göteborgê derbas dibin. Yek ji aliyê Åke Edwardson³⁰ û yek ji aliyê Renzo Aneröd de hatiye nivîsîn.³¹ Göteborgê angorî mezinahiya xwe piştî Stockholmê bajarê duwem ê Swêdê tê hesibîn. Di romana Åke Edwardson ya bi navê *Vänaste landet* de şevêkê sê kes di dikaneke de tînin kuştin. Kujer (an) li pey xwe tu şop nehîştine. Tu kesî ne ev bûyer nebîhistiye û nedîtiye. Di nav van sê kesên mirî de kesekî bi navê

27 Eva Susso, *Jag såg honom först!*, 2013.

28 Moni Nilsson, *Hoppet*, 2007.

29 Erik Löfvendahl, *Min skuld är min*, 2008, rûp.283.

30 Åke Edwardson, *Vänaste landet*, 2006.

31 Renzo Aneröd, *Vildsvinet*, 2007.

Hîwa Azîz jî heye. Dema polês li pey şopa kujer (an) dikeve divê cara pêşîn îfadeya nas û endamên malbata Hîwa Azîz bigre bona ku bibe xweyê hin agahî û zanyariyan. Du xwişkên Hîwa Azîz hene navê wan Sirwe û Nesrîn in. Navê dayîka wan Edîbe ye. Kesên ku wergeriyê dikin ew jî kurd in wek Mozaffer Kerîm. Di romanê de hin caran qala çanda kurdî tê kirin, wek muzîka kurdî, dengbêjên kurd ku li Swêdê mane³² û zimanê kurdî.³³ Di vê romanê de çend peyvên kurdî jî derbas dibin wek mînak “*Bo to Kurdîstan*”.³⁴

Bûyerên romana Renzo Aneröd jî li bajarê Göteborgê derbas dibin. Lehengê romanê xortekî kurd e ku tevî gelek tiştên neçê dibe wek lêxistin, kuştin, şantaj, dizî û narkotîkê. Navê wî Zanko Bêkes e. Ew dikeve nav çeteyan, dibe agir û alaf. Qasî sî kesan li dora xwe berhev dike û bi navê *Angered Gangsters* komeke êrişkar pêk tîne. Angered navê taxeke bajarê Göteborgê ye. Di nav vê komê de kesine ji netewe û gelên din jî hene wek Ninos ku koka wî asûrî ye.³⁵ Zanko 6 salên xwe di girtîgehê de derbas dike. Dema der-

dikeve hêviya malbata wî ew e ku Zanko êdî dev ji van xirabiyên berde û bibe kesekî qenc. Wisa nabe. Vê carê tiştine hin jî xirabtir dike. Zanko demekê şunda bi ekstremîstên îslamî re têkiliyan datîne û dikeve nav wan. Endamên vê malbatê gelek ji destê Zanko dikşînin, ji bo wan dibe keser û êşeke mezin. Zêdetirîn jî keça malbatê ya bi navê Dilşa ji destê Zanko zare zar e. Di romanê karektera here baş ev keça kurd e. Rojekê Zanko li Dilşahê dixebona ku Dilşa bi xortekî ji Vietnamê, Quang re têkilî daniye. Bi gef û xofan xwişka xwe ditirsîne. Navê wê Dilşa ye, lê belê ew ewqas dilşa jî nîne! Malbata Zanko ji Kurdistana Başûr e, ji Kerkukê ye. Di salên 1990î de ji gundekî bi navê Mamreş hatine Swêdê. Hêviyên malbatê mezin in. Dixwazin zarokên wan li Swêdê rojekê ji rojan bibin kurdi-ne here baş. Lê belê hemû hêviyên wan diçilmisin. Zêdetirîn lawê wan Zanko serê vê malbatê dibe bela. Zanko kalkê kalkê xwe Ehmedê Beraz ji xwe re kiriye rêber û mînak. Ji bo ku Ehmed kesekî êrişkar, beladar û dînik bûye navê wî danîne

32 Åke Edwardson, *Vänaste landet*, rûp.152.

33 Åke Edwardson, *Vänaste landet*, rûp.326-327.

34 Åke Edwardson, *Vänaste landet*, rûp. 327.

35 Renzo Aneröd, *Vildsvinet*, rûp.104.

Ehmedê Beraz.³⁶ Renzo Aneröd bi zanetî navê romana xwe jî daniye, *Vildsvinet* (Berazê hov). Nivîskar bi vî tehrî çîroka Ehmedê Beraz û newiyê wî Zanko di eynî romanê de cîwar kiriye. Ehmedê Beraz carcar di romanê de tê bi bîr anîn. Mirov dikare bêje ku çîroka malbata Zanko hê berî 70 salan dest pê dike, dema ku Zanko hê nehatiye dinê. Zanko ji bo ku rûmeta xwe, statûya xwe di nav xortan de winda neke, navê xwe li erdê nexwe dixwaze xwe hertim hêzdar nîşan bide û malbata xwe dike gorîyê vê zîhnîyetê.

Romana polîsî ya Lena Matthije ku bi navê *Lejonet från Zagros* di sala 2015an de hatiye waşandin ji alîkî de qala lêgerîneke polis dike, ji aliyê din nivîskar jîyana malbata kurdekî başûr dike ku heta Swêdê dirêj dibe. Omer Kerîm kurdekî zalim e hertim jina xwe dide ber lêdanan, li wê dixwe. Navê jina wî Eyşe ye. Malbat li gundekî bi navê Tazedê dijî. Rojekê Eyşe zarokan ser mêrê xwe de dihêle, winda dibe. Dema Omer Kerîm fêr dibe ku jina wî ji mal reviyaye çûye Swêdê, ew zarokên xwe berhev dike, li texsîyeke teqeze, xirabe sîyar dibin û berê xwe didin hat-nehatê. Pênc zarokên malbatê hene: Zana, Evîn,

Bayan û hevalcêwiyên bi navê Hiwa û Aram. Omer Kerîm lez dike, dixwaze zûtirekê xwe bighîne jina xwe, ji rewşa xwe re çare û rêyekê bibîne. Zarokên xwe li ortê bêxweyî dihêle. Jina Omer Kerîm diçe bal xwişka xwe Zara ku li Swêdê kesekî bi navê Azad Kemal re mêr kiriye. Azad mamosteyê matematîkê ye. Di nav salekê de li bajarê Ulrichamnê swêdî fêr dibe. Xewna wî hêdî hêdî dibe rastiyekê. Bûyerên ku di romanê de diqewimin 30/6 2013an dest pê dikin û di roja 1/7 2013n de dawî tên, qasî mehekê dajon. Di dawîya romanê de encamên vê lêgerîna polês û sedemê hatina endamên vê malbata kurd di çîhekî de dighêjin hev. Kujer bi vî tehrî derdikeve holê.³⁷ Polês dixwaze fêr bibe gelo ew bedena perçekirî ku di çemekî Swêdê de hatiye dîtin bedena kê ye û kujer kî ye/ne. Lêgerîna polês ku berê mehekê dest pê kiribû di dawîya romanê de encamên xwe nîşan dide. Şopa ku polês gerandiye tê dighêje Azad, mêrê Zarayê (xwişka Eyşeyê) ku li bajarekî Swêdê dimîne. Derdikeve holê ku kujer Azad e û kesê hatiye kuştin jî Omer Kerîm e ku ji Kurdistanê Başûr seferî Swêdê kiriye û li wir pey şopa jina xwe Eyşe ketiye.

36 Renzo Aneröd, *Vildsvinet*, rûp.37.

37 Lena Matthije, *Lejonet från Zagros*, 2015.

Çawa me li jor jî got 5 zarokên vê malbatê hene. Dema dê û bav li Swêdê mane, mezinê zarokan Zana ji xwîşk û birayên xwe yê piçûk re dê û bavtiyê dike. Di romanê de kesê ku herî zêde heyraniya xwendevanan bi dest dixê, di dilê wan de cîh digre ew xortê bi navê Zana ye. Di dawiya romanê de em dibînin ku dîya zarokan ji Swêdê vegehiyaye. Dema ew vedigere tê dighêja zarokên xwe, çend gotinên gelek şîrîn ji devê wê derdikevin û berê xwe dide Zana: ”*Du şêrê min î, Zana. Ew hêza te bû ku min bi kar anî. Ez dixwazim tu vê yekê bizanibî. Şêrê Zagrosê*”. Ji ber vê hevduhatina dilocan nivîskara romanê navê berhema xwe daniye: *Lejonet från Zagros* (Şêrê ji Zagrosê).³⁸

Çawa em di romana Katarina Bjärvall a bi navê *Under tiden* de jî dibînin hatin û mayina hin kurdan li Swêdê ewqas hêsa nebûye. Wek jîyana herdu biran Ronî û Zinar ku ji Kurdistana Tîrkiyê tên. Ronî ligel keçeke bi navê Newroz dijî. Zinar ku berî du salan koçberî Swêdê kiriye hewasa wî ya wêneçêkirinê heye û ji bo ku li Swêdê bimîne ew jî li ser kaxiz bi Newrozê re zewicî xuya

dike. Dema roja îfadegirtinê nêzik dibe, berî ku Dezgeha Koçberan dixwaze îfadeyên wan hilde, Newroz û Zinar nizanin wê çi bêjin, xewên şevan li wan heram dibin, adrenalîna wan yekcar bilind dibe. Piraniya romanê li ser van hersê kurdan e. Di dawiyê de derdikeve holê ku Ronî berî demeke dirêj ji jineke swêdî zarokek çêkiriye. Vê yekê bi êşkere ji Newrozê re dibêje. Bûyerên romanê bi vî tehrî dikevîne qonaxeke nû. Di vê romana Katarina Bjärvall de gelek gotinên kurdî derbas dibin.³⁹ Nivîskar di pirtûkeke xwe ya din de jî qala kurdan dike, serpêhatiya jineke kurd bi navê Asiye pêşkêşî xwendevanan dike.⁴⁰

Kurdên Swêdê di çend cîhên romanên Stieg Larsson de jî derbas dibin. Ev rêze-romanên wî ku bi giştî *Millenium* hatine bi nav kirin û bi milyonan hatin firotan ji sê romanên pêk tê: *Men som hatar kvinnor*, (2005), *Flickan som lekte med elden* (2006), *Luftslottet som sprängdes* (2007). Di romana *Flickan som lekte med elden* lehen-ga romanê Lisbeth Salander rojekê ji bo hin agahî û zaniyariyan diçe cîhê karê kurdekî Dîyarbekirê ku li

38 Lena Matthije, *Lejonet från Zagros*, rûp.348.

39 Katarina Bjärvall, *Under tiden*, 2008.

40 Katarina Bjärvall, *En gravad hund*, 2001, rûp.8-12.

Swêdê li bajarê Eskilstuna dimîne. Navê vî kurdî Refîk Alba ye û navê cîhê karê wî Auto-Expert e, ew bi karê tamîra erebeyan mijûl e. Lisbeth Salander tabanceya xwe dide cênîga vî kurdî bona wan agahiyên ku ew zane bide wê. Refîk Alba ji tirsan hemû tiştên ku hene didê û ji Lisbeth Salanderê xelas dibe.⁴¹ Di romaneke din ya Stieg Larsson de vê carê em Lisbeth Salander di nexweşxaneyê de dibînin. Lehengê romanê Mikael Blomkvist dixwaze di derbarê Lisbeth Salandera ku birîndar e bibe xweyê hin agahiyan. Lê belê çawa? Ew nasiya xwe dide kurdekî bi navê Idris Ghidi. Ew ji Musilê ye. Niha li bajarê Göteborgê di vê nexweşxaneyê de paqijiyê dike. Mikael Blomkvist rojekê diçe Göteborgê bona ku Idris Ghidi bibîne û daxwaza xwe jê re pêşkêş bike.⁴² Stieg Larsson di romaneke xwe de dîyar dike ku di nav kurdan de leşkerên jinîn peyda bûne ku di dîrokê de bi navê amazon hatine nasîn.⁴³ Nivîskar Arne Dahl di hin romanên xwe yên polîsiye de qala kurdan dike. Di romaneke xwe

de navê keçeke kurd dide (Naska Rizazî) ku niha navekî swêdî li xwe kiriye (Rosa Beckman). Di cîhekî romanê de nivîskar dîyar dike ku kurd navên jinan ji tiştên here xweşik ku di xwezayê de hene werdigrin wek Bahar, Ciwan, Gêlas, Hêro, Kajal, Sirwe û Xunce.⁴⁴ Di cîhekî romanê de tê gotin ku Naska Rizazî rojekê lêdixê birayê xwe Nedîm Rizazî bi kêrê dîkujê. Di eslê xwe de dema wan hev dîtiye, bira xwestiye xwişkê bikuje, lê belê xwişka wî bi lez ew kuştîye. Arne Dahl dixwaze nîşan bide ku di binê vê kuştinê de pîrsgirêka namûs û şerefê heye. Mirov baş fam dike ku nivîskar ew bûyera keça kurd Fadîme Şahîndalê ku di sala 2002an de ji aliyê bavê xwe de hatibû kuştinê daye ber çavan.⁴⁵ Di romaneke wî ya din de keçeke kurd Nefel Berwarî ku 15 salî ye û li hêla bajarê Örebroyê dimîne rojekê bê ser û berete, bêşop winda dibe. Malbata wê jî neçûye bal polês û windabûna keça xwe ji polês re negotiye. Ev yeka bêgûman bala polês dikîşîne.⁴⁶

41 Stieg Larsson, *Flickan som lekte med elden*, 2006, rûp.570-571.

42 Stieg Larsson, *Luftslottet som sprängdes*, 2007, rûp.224-276.

43 Stieg Larsson, *Luftslottet som sprängdes*, 2007, rûp.187.

44 Arne Dahl, *En midsommarnattsdröm*, 2003, rûp.222-223

45 Arne Dahl, *En midsommarnattsdröm*, rûp.111.

46 Arne Dahl, *Utmarker*, 2016, rûp.152-152.

Di hin romanên swêdî de carina tenê çend rûpel hene ku qala kurdan dikin. Wek romaneke Bodil Malmsten ku beşeke wê ji texsîajoyekî kurd re hatiye veqetandin. Ev şofer ji Kurdistana Başûr hatiye Swêdê.⁴⁷ Di kurteçîrokeke Bodil Malmsten a bi navê *Synd* de evîna di navbera kesekî kurd, Mehmed û jineke swêdî, Yvonne heye. Ev jina swêdî mêrkirî ye, navê mêrê wê Håkan e. Mêrê kurd, Mehmed zewiciye û jina wî jî heye. Lê belê ev herdu kes (Yvonne û Mehmed) dizîka, bi veşartî hev dibînin û ji hev hez dikin. Kêfa vê jina swêdî gelek ji Mehmedê kurd re tê. Destên Mehmed ên germ û xurt hîsên Yvonnê yên cinsî xweş hişyar dikin. Angorî Yvonnê ji vê hevdudîtina wan tu kes zirarê nabîne, her kes jî kardar derdikeve. Ev yeka him ji bo mêrê wê, him ji bo jina Mehmed derbas dibe, angorî mesaja kurteçîrokê ev hevdudîtina ji tu kesî re nabe xem, keder û bar.⁴⁸

Piraniya bûyerên van romanan li bajarên mezin wek Stockholm, Göteborg, Malmö, Lund û Uppsalayê, hin beşên romanan li cîhên din derbas dibin wek bajarokên Eskilstuna, Ulricehamn û Västeråsê. Ev yeka herwisa li ser erdê Swêdê firehbûna coxrafyaya belavbûna kurdan jî nîşan dide. Çend berhemên bona zarokan hatine nivîsîn jî koçberiya kurdan bi çavên zarokan tînin zimîn. Wek mînak di romana Thea Oljelund a bi navê *Hästen från Kurdistan* de serpêhatiya keçeke kurd bi navê Rosita ku hatiye Swêdê bi cîh girtiye. Di vê pirtûkê de babeta evîna hespan babeteke bingeîn e.⁴⁹ Nivîskarên kurd ku bi swêdî nivîsîne yan jî bi kurdî nivîsîne jî di hin berhemên xwe de cîh dane serpêhatiyên kurdên Swêdê.⁵⁰ Ev yeka mijara lêkolîneke din e.

47 Bodil Malmsten, *Den dagen kastanjerna slår ut är jag långt härifrån*, 1994, rûp.52-55.

48 Bodil Malmsten, *Undergångarens sånger*, 1998, rûp.183-191.

49 Thea Oljelund, *Hästen från Kurdistan*, 1984.

50 Rohat Alakom, *Kurdên Swêdê*, 2006, rûp.38-41.

Kilam

Yalcin Polat

Peyvek me yê din ku comêrên me tiştîzani bi sondxwarina li ser Xweda dibaxşînin Ereban peyva „kilam“e. Em dizanin stranên gelêrî û beytên dînî yên Riya Heq (Elewî/Yarsanî) di nava Kurdan da wek „kilam“ tên bi nav kirin. Di dema Zerdeştîyan ev beytên dînî bi navê „gatha“ dihatin nasîn ku wek gotinên destanî bi saz û enstrûmanan dihatin strandin. Peyva „gatha“ di zimanê Awesta de ji koka „ga“ (=strandin, helbest gotin) çê bûye.⁽¹⁾

Zordestên ku Kurdistan perçe perçe kirine ne tenê welatê me dagirkirîne, dîroka me jî tarî kirîne, çanda me jî diziyane û ji hemû dewlemendiyê çanda me mitîne; stranên me wergerandine zimanên xwe, peyvên me jî birîne û jê ra bêjenasiyên derewîn nivîsandine. Berê her tiştî karê etimologê Kurd divê dijberiya hemû derewên sed-salan be. Lê mixabin etimologên teral hêne, nikanin çendek ferheng vekin û lê mêzekin û fikrekî dijberî bimeşînin. Dibêjin: Tir-

kan, Ereban û Eceman ev tiştîna wuha nivîsandine, em çima xwe biêşînin..?“ û hemû karên ku di-kin wergerandina derewên xelkê heta zimanê me ye. Gava ku em şaşitîyên wan rexne dikin, meriko! tu bê ku qurana ku bi destê wan hatiye nivîsandine hatiye rexne kirine; ecîz dibin û ji ecîzîtiya xwe bera dû me didin û me bi nijadperestiyê suçdar dikin. Ev nijadperestiyek xeylî trajîkomike, gava ku ev ji aliyê kurdê bindest ve tê beyan kirin. Lê di zanistiyê de tiştêkî mitleq tune, tiştê ku îro hatin nivîsandin li ber zanînek teze sibê vala derdikevin. Zanistî li ber tişt û agahiyên nû xwe vekirî hîştine, peşveçûn wuha dimeşe. Xwe ji ber tiştên newîn kozkirin karê dîn û dînane, kevneperestî ne karê bîaqilane.

Em ji dîrokê dizanin, ku qewmên rojhilat (îranî, kurd, pers) bi qewmên rojavayî (yewnan, Makedon, Roma) ve herdem di reqabetekê da bûn. Carina medan û persan axa Anatolê heta nîviyê Yewnanistanê dagirkirî bûn, cari-



Jinên Kilambêj ji Rojhilata Kurdistanê

na Îskenderê Mezin yê makedon axa Îraniyan xistî bû bin destê xwe. Di şerên giran de rojhilat û rojava ew qas hevdu xirabe kirî bûn, ku firsend vê carê bikeve çend eşîrên bedewî yên çolan. Erebi bi riya îslamê hemû hêza xwe berhev kirî bûn êrîşek birin ser axa Îraniyan. Gava erebi ser ketin wan hemû Kurdistan û Îran talan kirin û hemû dewlemendî bi xwe ve birin. Bi wan ganîmetên bi dest xistî wan hêza xwe xurttir kirin û hemû pirtûken ji Îran heta Yewnanîstanê wergerandin zimanê erebî. Di vê demê de gelek peyvên îranî û yewnanî ketin nava zimanê erebî. Lê heta îro erebi koka gelek ji van peyvyan wek erebî didin nasandin û înkarkirinek berfirehî didome..

Yek ji wan peyvyan peyva „kîlam“ e, ku tevî ereban tirk jî wek erebî didin nasandin. ⁽²⁾ Tê îdia ki-

rin, ku ev peyva ji „kalama“ (=gotî/gotin) ya erebî jê derhatiye. Lê gava em vê peyvê bidin bin mercekê em hêsanî dikanin îspat bikin, ku ev peyva peyvek hint-ewropî ye û tu eleqeya xwe bi zimanên samîyan ve tune. Di ber-hînd-ewropî (proto-Indo-European) de koka „*gal“ hêye, ku maneya xwe „bang kirin/nalîn“ e. ⁽³⁾ Ew koka mîras maye kurdî ya modern jî, hemû peyvên wek „gilî, gilîn“ û „kalîn“ a pez û maran ji vê kokê ne. ⁽⁴⁾ Ji vê kokê „call“ ya Îngilîzî, „galamiti“ ya Bosnî peyda bûne. ⁽⁵⁾ Di yewnanî de jî „kal“ maneya xwe gilîkirin û bangkirine, „klama“ jî giriyanê bi denge. ⁽⁶⁾ Di vê warî de zimanê almanî peyvên „kallen“ û „klagen“ jî hêne. Bi taybetî „klagen“ maneya xwe „gil û gazind“ kirîne ⁽⁷⁾ Di malpêrek almanî de di kokê vê peyvê tê lêgerîn û bal tê kişandin ser peyva Awestayî „garəz-“,

ku di eynî maneyê da ye û peyva pehlewî (îraniya navendî) „glam“, ku maneya xwe „nalîn, gilîkirin û qîriyan“e. ⁽⁸⁾

Wekê din hevrehî bi peyva „kilam“ ê ve di nava wan peyvan de tê dîtîn:

– „clameur“ ya Frensî – „kalamos“ ya yewnanî, ku esil maneya xwe qamişe û paşe ji bo bilûran dihat gotin. Ev peyva ji yewnanî ketiye erebî jî û wek „qelem/qalam“ ji bo pênuşan bi kar tê. Di latîni de wekê „kalamus“ dîsa ji bo qeleman dihat bi kar anîn. – „glory“ ya îngîlîzî⁽⁹⁾. – „giriyan“ ê kurdî, eslê xwe bêguman „giliyan“ bû. – „qal“ kirina kurdî wekê behs kirin. – „qel“ a kirmackî/kirdkî ji bo qijikên reş. – „keleba(b)“ û „keleşîr“ ya kurdî ji bo xorizê awestayî û „dîk“ê erebî. – „gulbang“ ên kurdên elewî, ku

ji peyvên „gil/kil“ û „bang“ hatine berheve. Ev peyva derbasî tirkî jî bûye wekê „gülbang“, wekê ku kilamên dînî yên tariqata Bektaşîyan jî dihatin bi nav kirin.

Di encamê de em dibînin ku peyva „kilam“ di zimanê me de peyvek esîl–kurdî ye û ne ji erebî hatiye girtine û rehên xwe di hînt–ewropî de jî hêne. Ji bo klamek Yarsanî li ser Elî yê Haydar (Ingl.: „Wise Lord/God“) vira bitikînin: <https://www.youtube.com/watch?v=QHSrYjEW10k>

Ji bo gulbangek ji Dêrsimê bi Kirmanckî vira bitikînin: <https://www.youtube.com/watch?v=33TDCYG9is8>

Ji bo zimannasiyek bê derew bimînin di xweşiyê de.

(1) Wikipedia Almanî (<https://de.wikipedia.org/wiki/Gathas>)

(2) Çağdaş Türkçenin Etimolojisi, S. Nişanyan; (<http://www.nisanyansozluk.com/?k=kelam&x=0&y=0>)

(3) Indogermanisches etymologisches Wörterbuch. Julius Pokorny; Francke, Bern/ München 1959

(4) Wikîferheng gilîn (<https://ku.wiktionary.org/wiki/%DA%AF%D9%84%DB%8C%D9%86>) kalîn (<https://ku.wiktionary.org/wiki/kal%C3%AEn>)

(5) American Heritage Dictionary (<http://www.yourdictionary.com/call#americanheritage>)

(6) Ji bo zêdetir agahî nivîsa bi zimanê Tirkî "Kürtçe "KILAM" kelimesinin etimolojisi (<http://zernews.net/kurtce-kilam-kelimesinin-etimolojisi/>)

(7) Wikîferheng klagen (<https://ku.wiktionary.org/wiki/klagen>)

(8) Wissen.de Wortherkunft (<http://www.wissen.de/wortherkunft/klagen>)

(9) Your dictionary (<http://www.yourdictionary.com/glory>).

BAYÊ BAWERİYÊ

Xizan Şîlan

di fanosa dil de
ramanên felsefeya min
dibiriqin
li bêhntegiya rojên mijgirtî
cewhera derûniya xwe
kifş dikim
li navbera giravên giyan
him kaptanê keştiyê me
him jî rêwî
pisûla ronahiyê berbanga min e
ez ê
li nav vê bagerê
koşk û serayan pêk bînim
li kolanên bajarê kavilbûyî
tevena dîwarê hêviyê
bihûnim
kulîlkên şadiya rengîn
li hişkebeyaran
bireşînim
ez ê
perdeya mêjîyên tozgirtî
daweşînim
kaniya serkeftinê
ji çiyayên qendîl
biherikînim
bi gavên lez û bez
ber bi rêya baweriyê ve
bipekim
li ber kuliyên berfê
govenda egîd û mêrxasan
bikişînim
mîna bazê li asta zinaran
hêlîna xwe di tenêtiyê de
ava bikim

ez ê
ji pêşîra kul û kederan
meya kêf û sefayê
binoşim
li şevbihêrka dengbêjan
stranên Şakîro bilorînim
birîna arzûyên jankêş
bi xunava lêvên dilberê
bikewînim
li ber bayê agirê Zerdeşt
semaha serxweşiya eşqê
bigerînim
ez ê
dergehên perestgeha xwe
ji herkesî re vekim
û
têkevim zikira pêxemberan
beytika qefesa sîngê xwe
ber bi valahiya aso ve
bifirînim
kelepçeya bindestiyê
ji zend û bendên xwe
bişeqînim
giriye zarokan
qêrîn û hawara dayikan
di hembêza keskesora baranê de
aşt bikim
û ez ê
li ser textê jiyana bextewar
rûnim
azad û serbilind bijîm
ez ê bijîm

Mele Ehmedê Palo BASKŞIKESTÎ

Yusuf Polat



Kî jîyan û xebata wî dibihîze, dibîne ku Mele Ehmedê Paloyî qurbanê qeder û karesat, malbat û bêdewletîyê ye. Wî dîsa jî, di bin ewqas kederan da berhemên bêhempe afirandine.

Ehmedê kurê Mihemedê Mistefa li sala 1920a li Sêra çûre ya bi ser Palo re giredayî tê dinyayê. T.C. navê gundê wî jî gehurand, kir Güllüce (dagirkar di gehurandina navan de jî serkeftî ne, pi piranî navan baş lihevtînin). Bavê wî di serdema osmanîyan de teve şerê yekemin yê dinyayê dibe. Bes venagere. Ew jî teve kerwana bi milyonan mirîyan dibe wek kurdên ji gundê (Xelîkên Jêr) min, ku heya Yemenê çûn, bes carek din nehatin, jinên wan bi dehsalan li benda wan bûn. Seyda wiha dinivîse:

Di pê hezar û neh sed û bîstan

Min ji: dêya xwe berdaye biştan

Bavê min çûbû cengê kufara

Serbaz û leşker ji bo neyara

Min ew nedîbû derdê dilê min

Jê bixwêdî bûn bax û gulê min

Piştî sê salan dêya min diçû

Ez hiştim sêwî li ber dar û tû.

Zaroktîya xwe di xizanî, belangazî û perîşanî de derbas dike. Ew sê salî bû dîya wî bi kesekî din re dizewice. Ehmedê biçûk bê dê û bav, êdî temamî sewî û li cem apên xwe dimê. Ew dema, 1923-1932 demek pir dijwar bû. Bilî qeyrana aborî ya dinyayê, li welatê Kurdistan tarûmarî şer û pevçûn di rojavê de ye. Helbestvan wê demê wiha dida nasîn:

*Jar û belangaz, pêxwas û tazî
Nîne ji bo min hawar û gazî
Xeman diderim, kulan dihêrim
Be bav û bê dê dor xwe dinêrim*

Rojekê radibe bi çend hevalên xwe va tere Sîvrekê. Apê wî dikeve pê wî, wî dibîne, tîne mal:

*Rojek ez rabûm berê min li jêr
Dilê min bi tirs, destê min li dêr
Ketim newal û kartol û çala
Zinar û devî, hevraz û newala
Diçim ser darê gava dibe şev
Pelê darê ez li xwe didim hev*

Seydayê Palo piştî serhiladanên Kurdan, nemaza berxwedana Koçgîrî û komkujîya kurdên wir, û ji ber rewşa kambax berê xwe dide “binxetê”, ku hînge di bin desthilatdariya Fransa da bû. Li gundê Xiznayê nezîkî Qamişlo bi cih dibe. Bo dewara xwe car-caran berê xwe dide Mêrdînê. Çûyîn û hatin ne hesan e; berevajî dijwar e, tijî xeter e, ew jî geh însan in geh ajal in. Seyda wê rewşê wiha bi me dide nasîn:

*Gihame Mêrdîn, ketim nexweşî
Can û dilê min tahlî dinoşî (Canım ve yüreğim içti acı tadında)
Du meh li ser hev li wir dimame
Li raserî min toz û xumam e*

Ehmedê Paloyî li wê demê xortek e, heta hîn zarokek e, debarê/dewarê dijwar e, mal tune, nan tune, kar tune, wî hakîr dikin, bi çûk dibînin. Derbasî Nusaybînê dibe, şivanî dike. Dem 1937 in. Li wir rastî Cemîlê Seyda yê Lîce tê, yê ku ji Lîce berbî Dersîmê tere bona alîkarîya berxwedan û serxwebûna Dersîmê. Palo xwe bi Cemîl, yê ku li ser rê di şerê dijî artêşa Tirkîye de bi birin dibe, dide nasîn. Piştî ku Cemîlê Seyda serpêhatîya Palo bihîst, ji wî re got, „tu dikarî tenê bi xwandinê rewşa xwe biguherîn“ û dibê „herî cem Şeyh Ehmedê Xiznawî yê li gundê Xizna di navçêya Qamişli de.“

Ketî dilê min herim bixwîn im

Kule dilê xwe de ez hilîn im

Seyda êdî xwe digehêje Seyh Ehmedê Xiznawî. Xiznawî dibê, „navê min jî Ehmed e, yê te jî. Ma tevlihevî nebe, navê te Ehmedê Paloyî be.“ Erê navê wî êdî Ehmedê Paloyî, Mele Ehmedê Paloyî ye. Palo, li medresa Xiznavî dixwîne wek feqî. Mele heft û heşt salan dixwîne. Piştra ew jî teve kerwana nemir Cigerxwîn dibe, li gundan meletî/hocatî dike. Êdî navê wî Mele Ehmedê Paloyî ye. Pir zimanan dizane, hemû zaravayên kurdî, erebî, farsî û tirkî. Di medreseyan li Kurdistan da ji berê de ziman bi kurdi (kurmancî) bû heya ku ew bên rakirin, qedexekirin. Bo vê jî Palo kurmancî baş dizanî. Qesîdeyên wî hunere heqîmîyet û xwedîşayana zimanê kurmancî nişan dide. Piştî qedandina perwerdeyê li medresa navdar û nemir, ronekbîr û alîmdarê kurd Xiznavî wek mele ji bin xetê tere serxetê, gundike Weysîk, ku berê li wir şivanî kiribû û keça kurd Medîe naskiribû. Bi zor û zehmetan di 1946an de dizewice. Mamoste bona wê demê disa dest davêje penûs:

Çûme Wêsîkê ketî dilê min

Da xuya bin bax û gulê min

Nûşokê dênim bibim xwedî mal (kurayim aîle, olayim ev sahibi)

Bo xwe vejînim newroz û sersal

Perwerdayîya li medresê li ber destên mamostê Xiznavî dibe feqî bi serda jî hosteyê zimanê kurmancî. Li wê demê binxet /Rojava bûbû war û çavakanîya wêjaya kurdî û kurdîyatîya nûjen. Bingeha zimanê kurdî ya bi latîni li vir tê avêtin; Nemir Celadet Alî Bedîrxan kovera Hawar derdixe. Keseyatên wek Celadet û Kamuran Bedîrxan, Cîgerxwîn, Qedrican, Nuredîn Zaza, Osman Sabrî bi nivîs û helbestên xwe namdar in, qedirbilind in. Mele Ehmedê Paloyî ji li cihê ku hîş û raman û kurdîyatî û welatparazî pir bilind, bi ser da jî li ber destên Xiznavî bi ziman û ava kurdîyatî koçbûyî helbestan li ser welatê xwe, gelê xwe, netewa xwe dinivîsîne. Bo vê jî ji alîye xwedîye medresêyî nû, Şeyh Îzeddin va bi kavîmtî û nijadparastî tê tomarkirin, lêdanên giran lêdikin. Bes êdî tîr ji cih derket, kesek nikare Ehmedê Paloyî bigire. Ehmedê Paloyî bûye kêxîlekî, serî heynayê ezman, bi serda jî bîranîna welat, kom, qebîle û xizmen xwe, bi hestek zîzî kûr û dûr li bilûra xwe dixe; Cih û warê minî Palo

*Ji bona min tu hêlîn î
 Bi vî rengî nedî halo
 Ji bo çavê mi dûrbîn î
 Tu daxwaza dil û canî
 Dikim nakim te nabînim
 Divoka canê heyranî
 Gul û reyhan û nesrîn î
 Di qeyda dijminê bedkar
 Nedî xweşî vejîndar î
 Di benda xayin û bêzar
 Demek sor û reş û şîn î
 Di çola bend û evdal î
 Perîşan î belengaz î
 Di tola şûr û mertalî
 Qe carek xweşî nabînî
 Di gola dijmin û can î
 Di hepsa agir û kîn î
 Cih û warê birîndar î
 Tenê bê rûmet û jîn î.*

Ji ber hesreta welatê xwe, ango gund û koma merîvên xwe Emedê Palo di qeda giyayî û derûnî de ne rehet e. Ew hesta wek bi min nas tê. Bavê min î delal nexwaş bû; ez ne li cem wî bûm, li ber destên wî nezivîrim/çerxnebûm, hizmeta wî nekir; li ber zikira bû, min dengê wî bihîstibû. Ew rewşa ji min re li xerîbî bûbû derd û kul, tendurîstîya min ne baş bû, di qeda derûnî de berbi xirabî diçûm. Kîngê min gora bavê xwe, li cem hemû kom û qebîla wî ya di goristanê bi navê apê wî tê xwandin de, dît, kesera min piçek ket. Di qeda gîya û derûnîyê neketim de bi ser ketim. Bes ew nebû nesîbê Ehmedê Paloyî. Helbestvan li alîyekî di hesreta gundê xwe û Paloyê de, li alîyê din bêrîya welat dike. Derd û kul wî serxoş di-kin, helbestvan wek li bilûrekê xe, hesîrên xwe wiha dirêjîne:

*Wek xewnê tê bîra min
Ji gunda em çûne der
Rengê polad û hesin
Ketin lat û der û ber
Di nav baran û berfê
Tevde li ser çiya bûn
Arê dijmin çawa tê
Li ber dest û piya bûn
Agir berdabû gundan
Mêr û jin tev dikuştin
Mar û zihak û kundan
Qîz û kur sêwî hîştin
Berê xwe dabû çolê
Pî xwas û pî qelaştî
Pelê daran ez dixum
Ling û destê min biraştî
Li ber sermayê mixum
Nikarim tev bibêjim
Hewqa derd û kul û jan
Divê pîrsek birêjim
Carek li ber pî û dest
Carek li çol û derva
Carek nexweş û sermest
Di ber baran û berfa*

(Nivîskar naxwaze qala mirina Mela Ehmedê Paloyî bike, nexasim wî jîndar bike. Nivîs dom dike.)

Bermekiyên Kurd di kûraniya dîrokê da

-1-



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



Wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Bermekî di dîroka Îslametiye da malbateka navdar û payebilinde û di sala 132ê goçî da di damezrandina *Dewleta Ebbasî* da beşdarî kirine. Pir kesan ji vê malbatê asta wezaretiyê di *Dewleta Ebbasî* da standine û hên di destpêka heyama *Ebbasî* da, di geşkirina şaristaniyê da, bi awayekî çalak û nixrdar beşdar bûne. Lê belê, berî ku em li keda wan di geşkirina şaristaniyê da bikolin û behsa serpêhatiya wan bi fermana xelîfeyê *Ebbasî Harûn El Reşîd* bikin, ka em awirekî bidin rah û damarên vê malbatê di kûraniya dîrokê da.

Mog - Mecûs - Bermek:

Li dora salên 1100î b.z. gelê *Mad* (pêşiyên gelê kurd) li derdorên çiyayên Zagrosan bi cih û war bûbûn. Ji dewleta wan ra, ya wê demê li çiyayên Zagrosan, *Gotiyom (Gotium)* dihate gotin; li gor şaxê *Gotî / Cûtî* ji pêşiyên

Kurdan. Lê di hezarsalê pêşî yê b.z. da, bi navê *Mad (Midiya)* hatin naskirin. Mad bixwe ji yekîtiya şeş êlên mezin pêkdihatî, ew jî wek ku *Diyakonov* dibêje ev in: **Boudloî, Arizatoî, Strouknates, Paretaknoî, Boussi û Magoî**. Ev nav jî pir dişibihin ew ên ku *Herodotes* gotine⁽¹⁾.

Niha ji bo mijara me, ev êla *Madan Magoî (Mag, Mog, Mûg)* girîng e. Ji ber ku *Ayîna Ezdayî (Yezdani)* wê hingê li welatê *Mad* serdar bû û pêximber *Zerdeşt* jê ra *Mezda Yesna* yanê *Ayîna Mezda* gotiye. Wek ku di jêderên dîrokî da hatiye, ev êla *Magoî* pispora kar û barên ayînî bûye⁽²⁾. Rola wan dişibihe rola êla *Lawî* ya *Îbranî* ku ew jî pispora kar û barên ayîna *Cihûyî* bû û pêximber *Mûsa* jî ji wê êlê ye. Û herwisa dişibihe rola êla *Qureyş* ku ew jî pispora kar û barên ayînî ye li ba ereban di dema berî Îslametiye da û pêximber *Muhemmed* ji vê êlê ye. Vê

1 Dyakonov, *Midiya*, rûpel 143, 146. Herodotes, *Dîroka Herodotes*, rûpel 80. Arshak Safrastiyân: *Kurd û Kurdistan*, rûpel 24, 25. Delaport, *Welatê Mezopotamya*, rûpel 308.
2 Dyakonov, *Midiya*, rûpel 359, 390.

êla *Magoi* di Zerdeştîyê da jî ev rola xwe parastîye. Dîroknasên Yûnanan (Girekan) ev nav bi awayê *Magos* / *Magûs* nivîsandine û ereban jî bi awayê *Mecûs* gotine⁽³⁾.

Peywendîya vê peyva *Bermek* pir bi peyva *Mag / Mog* yan jî *Mecûs* ra heye. Şîrovekirina herdiyan jî, ji du hêlan va, pir li nêzî hev e:

Yekem: Peyva *Bermek* ji peyva kurdî *Bermak* hatiye erebkirin. Di vê babetê da peyva *BER* tê maneya pêwan, oldar, xizmetkarê Xweda û peyva *MAK* tê maneya *Mala Pîroz, Mala Resen, Mala Dayîkî*.

Duwem: Ji parêzvanê perestgeha zerdeştî (mala agir) ra *BERMOG* dihate gotin; yanê ew oldarê berpirsiyar ji ber perestgehê va. Ev nav di jêderên erebî da bi awayê *BERMEK* hatiye, ji ber ku tîpa (g) di zimanê erebî da tineye.

Diyakonov dibêje ku di dema *Sasaniyan* da jî *Magwpati = Mogbedan* ra *Mobedyan* dihate gotin⁽⁴⁾. Ev nav bi awayên (*Mewbezan*) û (*Mewbedan*) derbasî jêderên erebî bûye. Ev *Mewabed* berpirsiyarên perestgehan (malên agir) bûn û ji serekê herî bilind ra (*Mewbed, Mewbedan*) dihate gotin. Asta vî *Rêveberê Ayînî* di hemû

babetên ayînî da asta here bilind bû û rola wî wek rola Papa li ba Xiristîyanan bû. Wî çavdêrî li dad û yasayê û pêkanîna dademendiyê, li pêkanîna nimêjê, lidarxistina şahîyan di dema wan da û parastina agirê pîroz di perestgehan da dikir. Ji mafê wî bû jî ku di roja Newrozê da bersivê ji padîşah bixwaze heger kesekî dozek li dijî wî (li dijî padîşah) rakiribe⁽⁵⁾.

Beşekî din ji oldaran hebû ku karê wan ew bû, agirê pîroz di perestgehan da her vêketî bimîne. Ji van kesan ra (*Harbed*), bi kurdiya niha (*arbed*) dihate gotin. Yanê ew kesê ku herdem êzing û daran li agir dike daku her vêketî bimîne. Di pirtûka pîroz *Avesta* da (*Athrapatî*) hatiye gotin û maneya (*Athrapatî / Harbed / Arbed*) her mîna hev e. Ev nav di jêderên erebî da bi awayê (*Herbez*), bi şeweyê gelemperî (*Herabize*) hatiye. Ji serekê wan ra (*Herbezan / Herbez*) dihate gotin. Radeya *Herbezan* di asta duwem da piştî ya *Mewbedan* dihat⁽⁶⁾.

Ev peyva (*Mog / Mag*) di bermaya îslamî kurdî da bi awayê (*Şêx Mog*) heya niha maye. Li herêma *Efrîn*, li *rojavayê Kurdistanê*, bi gelemperî di sibeha roja îniyê da hin kes li ser malan digeriyan, hin sirûdên ayînî digotin û

3 Herodotes, *Dîroka Herodotes*, rûpel 25, 259.

4 Diyakonov, *Midiya*, rûpel 361.

5 Faris Osman: *Zeradesht û ayîna Zerdeshtî*, rûpel 21, 100.

6 Faris Osman: *Zeradesht û ayîna Zerdeshtî*, rûpel 100 - 101.

wisa hinek dirav, ard û zeyt dicivan-
din. Ev hên ji bi navê (*Şêxê Mog*) tên
naskirin. Wisa tê xuyakirin ku ev nav
bi encama têkillkirina navê îslamî (*Şêx*)
û navê Ezdayî (*Mag/Mog*) pêkhatiye.

Kok û binyata malbata

Bermekî:

Daku em kok û binyata malbata
Bermekî nasbikin, divêt em 25 sedsalan
paşva vegerin û bi aliyê bakur-rojhilat
va ber bi Afganistanê herin. Li wir
bajarê *Belx* heye. Wek ku tê zanîn,
pêximberê *Mad*, Zerdeşt li bakur-
rojvayê Kurdistanê li nêziya *Gola*
Ûrmiyê ji dayîk bûye û gava li wê
herêmê doza wî nehate pejirandin, çû
bajarê *Belx* ba padîşahê Farisî *Hêst-Esp*
û li wir ayîna xwe belav kir. Li dora
salên 551-553ê b.z. Toraniyan bajarê
Belx talankirin û pêximber Zerdeşt di
temenê 77 salî da, li gel 80 oldarên
Zerdeştîyan di perestgeha zerdeştî da
kuştin. Ji wê demê da perestgehên
Zerdeştîyan li wê herêmê hebûn û
man⁽⁷⁾.

Di jêderên ereban da hatiye ku baja-
rê *Belx*, ji ber bedewiya surîştîya wî, wek
bihušta Xurasanê dihate binavkirin. Di
wê demê da *Bermekî* oldarên perestgeha

zerdeştî *Nûbihar* bûn. Li wir ji oldarê se-
reke ra *Bermek* dihate gotin. Gelên wan
herêman, padîşahên *Hind* û *Çin-Maçîn*
û yên *Asiya Naverast* wek hecî dihatin
serdana perestgeha *Nûbihar*, diyarî jêra
dihanîn, cil û berg li perestgehê dikirin
û li ser kopa wê ala hildidan. Ji kopa
wê perestgehê ra “*Ûstûn*” dihate gotin.
Perestgeh pir qeşeng û bedew bû û bi
awayekî çarçoşe, sed gaz bi sed gazî ha-
tibû avakirin. Bilindahiya banê wê jî
bêhtirî sed gazî bû. Li dor-medara wê, li
nêziya 360 koşk ji bo oldar û xizmetka-
ran hebûn⁽⁸⁾.

Gava di heyama xelîfe *Osman Ibin*
Effan da talanên ereban gihîştin baja-
rê *Belx*, koma oldaran bi serpereştîya
bapîrê mezin *Bermek* bû ku navê wî
di jêderan da nehatiye naskirin. Navê
bavê wî *Camas kurê Yeştasf* bû. *Bermek*
li gel hin rêveberên wê herêmê diçe
bajarê Medîne, paytexê xîlafetê daku ji
xelîfe *Osman* ra diravê ku ji bajarê *Belx*
civandibûn pêşkêş bike. Li wir *Bermek*
Misilmantiyê werdigire û navê *Ebdul-*
lah li xwe dike. Gava vedigere bajarê
xwe, dibîne ku ew ji serokatiya oldaran
avêtine û yek ji kurên wî wek *Bermek*
danîne cihê wî. Padîşahêkî wê herêmê
ku jêra *Neyzek* dihate gotin, jê dixwa-

7 Ibin Xellikan, Wefeyat El E'hyān, 1/328. Sulaiman Mazhar: Dîroka Ayînan, rûpel 297, 311.

Hamed Abdulkadir, Zeradeştê Aqilmend, pêximberê pêşiyên Iraniyan, rûpel 11.

Hasan Nî'hme: Kana Mîtologiya û Efsaneyên Gelên Kevin, rûpel 63.

8 El Miqdîsi El Beshari: Ahsan El Teqasim fi Me'hrifet El Aqalim, rûpel 302. Yaqok El Hamawî:
Ferhenga Welatan, 5 / 307 -308. Ibin El Feqih El Hemezani. El Buldan, rûpel 617.

ze ku vegere ser ola xwe ya Zerdeştî. Lê gava ew napejîrîne, padişah radibe wî dikuje. Li ser vê bûyerê, malbat bi giştî bazdide û diçe herêma *Keşmîrê* li bakurê Hindistanê. Xelkê bajarê *Belx* ji wan dixwazin ku lawekî xwe bişînin daku bibe oldarê perestgehê. Ev law, ev *Bermekê Duwem* bapîrê malbata *Bermekiyan* e⁽⁹⁾.

Di hin jêderên ereban da hatiye ku *Bermekî* malbateka faris e. Lê belê ev agahdarî ji bingegehê da ne durist e û vegerandina *Bermekiyan* ser raha farisan mijareka siyasî û çandî ye, ne neteweyî ye. Dîrokzan û dadwerê navdar *Ibin Xellikan* dibêje ku *Bermekî* bapîrên wî ne û ew kurd in, ne faris in. Kurê wî *Mûsa* dibêje: „*Û ji min ra hate gotin ku êla ew jê ye kurd in; ew êla ku bi navê Zurzarî nasdar e û bavê wî û dayîka wî ji bajarê Belxê ne ku li Xurasanê ye.*

Gotiye ku koka bapîrên wî ev in: Muhemmed Bin Îbrahîm Bin Ebo Bekir Bin Xellikan Baik (Bawik) Bin Ebdullah Bin El Huseyn Bin Malik Bin Ce'hfer Bin Yehya Bin Xalid Bin Bermek⁽¹⁰⁾.

Bi vî awayî, ew gotina *Ibin Xellikan* piştrast dike ku malbata *Bermekiyan* kurd e û ji êla kurdî *Zurzarî* ne (yanê kurê gur). Ev tê wê maneyê ku êla *Zurzarî* şaxek in ji êla *Magoi* ya Madan. Ma wê çawa *Ibin Xellikan* ev agahdarî gihandibe kurê xwe, heger ew ji vê yekê sedî sed ne piştrast û bawer be?

Kesayetiyên here navdar ji malbata *Bermekiyan* di heyama Ebbasî da evin: *Xalid Bin Bermek, Yehya Bin Xalid, El Fedil Bin Yehya û Ce'hfer Bin Yehya.*

Berdewam dike.

9 Yaqot El Hamawi: Ferhenga Welatan, 5/308. Ibin El Feqih El Hemezani. El Buldan, rûpel 618.

10 Ibin Xellikan, Wefeyat El E'hyan, 479.



Kobanê (serkeftina hêviyê) 98x24 inch, acrylic, 2015

Hunermendekî kurd, Lukman Ahmad

Lukman Ahmad hunermendekî kurd ji Sûriyê ye. Wî kariyera xwe ya hunerê di 1986an dest pê kiriye. Piştî ku di sala 2010an de, wek pênaber bar kir Amerîkayê bi çend komên hunerî yên Amerîkî re xebitî.

Di pêvajoya hunera xwe de Lukman av, boyaxa rûnî, rengên akril, û pastel bi kar anîne.

Piraniya berhemên Lukman bi mîrasa kurdî, ku bi çîrokên



gelêrî û destanên populer hatine dewlemendkirî ve têkildar in.

Lukman di hunera xwe de dide dîyarkirin ku ew li dinyayê ferdekî ji mezintirîn neteweyên bêdewlet e.

Ew dewlemendiya mîrasa gelê xwe, di firçeya boyaxê û motifên xwe de dîyar dike û bi heyrani çanda kurdî direngîne.

Rêbazên hunera Lukman xweser û yekane ne. Çavkanîyên hunera wî bi êlêmêntên rastî yên vekirî ve hunandî ne.

Bi zêdetirî di 45 pêşangehên gelek welatan de beşdar bûye, di nav wan de Sûriye, Tirkîye, Kurdistana Iraqê, Swîsre, Lubnan û Dewletên Yekbûyî jî hene. Lukman di van pêşangehan de bi serkeftî nunertiya hunera xwe kiriye.

Lukman ji derveyî karê hunerê niha di radyoya Dengê Amerika de kar dike. Bernameya wî ya bi navê *Deng û Reng* li ser kar û xebatên çandî û hunerî ne.

Alî Çiftçî

DEMÊN BORÎ

H. Hüseyin Deniz

D- ÇÎROKIYA DEMA BORÎ YA NE DIYAR

(rayeka dema borî ya ne diyar + rayeka lêkera bûn+paşgira kesanî û li dawiyê -e/-ye tê zêdekirin)

I-Lêkerên bi -în bi dawî dibin:

a- lêkerên negerguhêz/intransitiv

I-(lêkerên bi kîteyekê) : barîn, bezîn, borîn, civîn, çirîn, êşîn, firîn, gerîn, kelîn, kenîn, meşîn, qedîn, qetîn, revîn, weşîn,

II-(Lêkerên bi du kîteyan) : herikîn, peyivîn, qerisîn, qewimîn, şewitîn, xeyidîn,

I- lêkerên bi kîteyekê; paşgira(daçeka) raderî jê tê avêtin, -iya tê şûna wê, lêkera bûn li gorî kesan tê kişandin û bi ser tê ve kirin.

Kenîn	ez ken+iya+bûme	ez giriyabûme
	tu ken+iya+bûye	tu giriyabûye
	ew ken+iya+bûye	ew giriyabûye
	em ken+iya+bûne	em giriyabûne
	hûn ken+iya+bûne	hûn giriyabûne
	ew ken+iya+bûne	ew giriyabûne

II- lêkerên bi du kîteyan; paşgira raderî jê tê avêtin û lêkera bûn a li gorî kesan tê kişandin li ser tê zêdekirin -e li dawiyê cih digre

Peyivîn	xeyidîn
ez peyivîbûme	xeyidîbûme
tu peyivîbûye	tu xeyidîbûye
ew peyivîbûye	ew xeyidîbûye
em peyivîbûne	em xeyidîbûne
hûn peyivîbûne	hûn xeyidîbûne
ew peyivîbûne	ew xeyidîbûne

b- Lêkerên gerguhêz / transitiv Verben

çinîn, karîn, nasîn, nêrîn, nivîsîn,

paşgira raderî -în tê avêtin û ji bo hemû kesan -î tê şûnê, lêkera bûn li

ser tê zêdekirin, –e li dawiyê cih digre:

min ew çinîbûye min pê karîbûye
te ew çinîbûye te pê karîbûye
wî, wê ew çinîbûye wî, wê pê karîbûye
me ew çinîbûye me pê karî bûye
we ew çinîbûye we pê karîbûye
wan ew çinîbûye wan pê karîbûye

2–Lêkerên bi –irin, –arin bi dawî dibin:

a–lêkerên negerguhêz /intransitiv verben
mirin,

paşgira raderî jê tê avêtin û lêkera bûn a li gorî kesan tê kişandin, li ser
tê zêdekirin, –e li dawiyê cih digre

ez miribûme
tu mirbûye
ew miribûye
em miribûne
hûn miribûne
ew miribûne

b–lêkerên gerguhêz /transitiv verben

xwarin, kirin, vexwarin, birin,

paşgira raderî tê avêtin û ji bo hemû kesan wekî xwe dimîne, lêkera bûn
lê tê zêdekirin (ji ber hevşengiya deng berya lêkera bûn –i li ser rayekê tê
zêdekirin) –e li dawiyê cih digre:

min ew xwaribûye
te ew xwaribûye
wî, wê ew xwaribûye
me ew xwaribûye
we ew xwaribûye
wan ew xwaribûye

3–Lêkerên bi –endin, –andin bi dawî dibin:

a– lêkerên negerguhêz (intransitiv)

b– lêkerên gerguhêz /transitiv verben

barandin, bezandin, ceribandin, civandin, çirandin, domandin, êşandin, firandin, gerandin, guherandin, herikandin, kişandin, kelandin, kenandin, meşandin, nasandin, peyivandin, qedandin, qerisandin, qetandin, revandin, rijandin, sitendin, şandin, şewitandin, tewandin, weşandin, xebitandin, xeyidandin, zîvirandin

paşgira raderî jê tê avêtin û li gorî hemû kesan wekî xwe dimîne, ji bo hevsengiya deng –i li ser rayekê tê kişandin û lêkera bûn tê dawiyê, –e li dawiyê cih digre:

min (ew) êş kişandibûye
 te (ew) êş kişandibûye
 wî, wê (ew) êş kişandibûye
 me êş (ew) kişandibûye
 we êş (ew) kişandibûye
 wan êş (ew) kişandibûye

4–Lêkerên bi –ûn bi dawî dibin:

a– lêkerên negerguhêz / intransitiv Verben
 bûn, çûn, rabûn, vebûn

tîpa dawîn –n jê tê avêtin û li şûna wê tîpên qertafîn ên kesane tên bicihkirin, lêkera bûn li ser tê zêdekirin. Ji ber ku du caran –bû hevsengiya ziman qels dike, li şûna wê –bi tê bikaranîn, –e li dawiyê cih digre.

ez bû(bi)bûme mamoste	ez çûbûme dibistanê	ez rabibûme ser xwe
tu bû(bi)bûye mamoste	tu çûbûye dibistanê	tu rabibûye ser xwe
ew bû(bi)bûye mamoste	ew çûbûye dibistanê	ew rabibûye ser xwe
em bû(bi)bûne mamoste	em çûbûne dibistanê	em rabibûne ser xwe
hûn bû(bi)bûne mamoste		hûn çûbûne dibistanê
hûn rabibûne ser xwe		
ew bû(bi)bûne mamoste	ew çûbûne dibistanê	ew rabibûne ser xwe

c–lêkerên gerguhêz / transitiv Verben

5–Lêkerên bi –an bi dawî dibin:

a– lêkerên negerguhêz / intransitiv verben
 man, zan, pan, razan,

tîpa dawîn –n jê tê avêtin û li şûna wê lêkera bûn a bi tîpên qertafîn ên kesane hatiye kişandin tê bicihkirin, –e li ser tê zêdekirin.

ez mabûme	ez razabûme
tu mabûye	tu razabûye
ew mabûye	ew razabûye
em mabûne	em razabûne
hûn mabûne	hûn razabûne
ew mabûne	ew razabûne

b– Lêkerên gerguhêz /transitiv verben

dadan, badan, kolan, dan, radan, kutan, lêdan,

tîpa dawîn –n jê tê avêtin tiştê dimîne rayek e, lêkera bûn a li gorî kesan tê kişandin, tê dawiyê –e li ser tê zêdekirin..

min sobe dadabûye	min lingên xwe radabûye
te sobe dadabûye	te lingên xwe radabûye
wî sobe dadabûye	wî lingên xwe radabûye
wê sobe dadabûye	wê lingên xwe radabûye
me sobe dadabûye	me lingên xwe radabûne
we sobe dadabûye	we lingên xwe radabûne
wan sobe dadabûye	wan lingên xwe radabûne
me (gelek) sobe dadabûne	
we (gelek) sobe dadabûne	
wan (gelek) sobe dadabûne	

6–Lêkerên bi –tin bi dawî dibin:

a– lêkerên negerguhêz /intransitiv verben

hatin, gihiştin, ketin, nivistin,

paşgira raderî –in tê avêtin û li gorî kesan tê kişandin

ez hatibûme	ez ketibûme
tu hatibûye	tu ketibûye
ew hatibûye	ew ketibûye
em hatibûne	em ketibûne
hûn hatibûne	hûn ketibûne

ew hatibûne ew ketibûne

b– lêkerên gerguhêz / transitiv verben

alastin, firotin, avêtin, bihîstin, bijartin, biraştin, cûtin, dîtin, dotin, gestin, girtin, gotin, guhertin, guhestin, guvaştin, hejmartin, hinartin, hiştin, jentîn, kuştin, lîst, malaştin, mêtin, pişaftin, parastin, qefaltin, qeşartin, rêstin, rêtin, rîtin, sotin, şuştin, xistin, xwestin

ji lêkerê paşgira raderî –in tê avêtin, tişta dimîne rayek e, –e li ser tê zêdekirin.

min alastibûye min avêtibûye

te alastibûye te avêtibûye

wî alastibûye wî avêtibûye

wê alastibûye wê avêtibûye

me alastibûye me avêtibûye

we alastibûye we avêtibûye

wan alastibûye wan avêtibûye

E– DEMA BORÎ YA DOMDAR /ÇÎROKIYA DEMA NIHA / DEMA BORÎ YA BERDEST

(–di+qertafa dema borî ya diyar+paşgira kesani)

I–Lêkerên bi –în bi dawî dibin:

a– lêkerên negerguhêz/intransitiv

I–(lêkerên bi kîteyekê) : barîn, bezîn, borîn, civîn, çirîn, êşîn, firîn, gerîn, kelîn, kenîn, meşîn, qedîn, qetîn, revîn, weşîn,

II–(Lêkerên bi du kîteyan) : herikîn, peyivîn, qerisîn, qewimîn, şewitîn, xeyidîn,

I– lêkerên bi kîteyekê; paşgira(daçeka) raderî jê tê avêtin, –iya tê şûna wê, pêşgira demîn –di tê ber rayekê.

Kenîn ez diken+iya+m

ez digiriyam

tu diken+iya+yî

tu digiriyayî

ew diken+iya+–

ew digiriya

em diken+iya+n

em digiriyan

hûn diken+iya+n

hûn digiriyan

ew diken+iya+n

ew digiriyan

II– lêkerên bi du kîteyan; paşgira raderî jê tê avêtin û li gorî kesan tê kişandin.

Peyivîn ez dipeyvîm	ez dixeyidîm
tu dipeyivî(yî)	tu dixeyidî(yî)
ew dipeyivî	ew dixeyidî
em dipeyvîn	em dixeyidîn
hûn dipeyvîn	hûn dixeyidîn
ew dipeyvîn	ew dixeyidîn

b– lêkerên gerguhêz / transitiv verben

çinîn, karîn, nasîn, nêrîn, nivîsîn,

paşgira raderî –în tê avêtin û ji bo hemû kesan –î tê şûnê, pêşgira demîn

– di tê ber rayekê:

min ew diçinî	min pê dikarî	(min ew nedîçinî min pê nedikarî)
te ew diçinî	te pê dikarî	
wî, wê ew diçinî	wî, wê pê dikarî	
me ew diçinî	me pê dikarî	
we ew diçinî	we pê dikarî	
wan ew diçinî	wan pê dikarî	

2–Lêkerên bi –irin, –arin bi dawî dibin:

a-lêkerên negerguhêz /intransitiv verben

mirin,

paşgira raderî jê tê avêtin û li gorî kesan tê kişandin, pêşgira demîn –di

tê ber rayekê

ez dimirim

tu dimirî

ew dimir

em dimirîn

hûn dimirîn

ew dimirîn

b-lêkerên gerguhêz /transitiv verben

xwarin, kirin, vexwarin, birin,

paşgira raderî tê avêtin û ji bo hemû kesan wekî xwe dimîne, pêşgira

demîn –di tê ber rayekê:

min ew dixwar
te ew dixwar
wî, wê ew dixwar
me ew dixwar
we ew dixwar
wan ew dixwar

3–Lêkerên bi –andin, –andin bi dawî dibin:

a– lêkerên negerguhêz (intransitiv)

b– lêkerên gerguhêz /transitiv verben

barandin, bezandin, ceribandin, civandin, çirandin, domandin, êşandin, firandin, gerandin, guherandin, herikandin, kişandin, kelandin, kenandin, meşandin, nasandin, peyivandin, qedandin, qerisandin, qetandin, revandin, rijandin, sitendin, şandin, şewitandin, tewandin, weşandin, xebitandin, xeyidandin, zivirandin

paşgira raderî jê tê avêtin û li gorî hemû kesan wekî xwe dimîne, pêşgira demîn –di tê berya rayekê:

min (ew) êş dikişand

te (ew) êş dikişand

wî, wê (ew) êş dikişand

me êş (ew) dikişand

we êş (ew) dikişand

wan êş (ew) dikişand

4–Lêkerên bi –ûn bi dawî dibin:

a– lêkerên negerguhêz / intransitiv Verben

bûn, çûn, rabûn, vebûn

tîpa dawîn –n jê tê avêtin û li şûna wê tîpên qertafîn ên kesane tên

bicîhkirin, pêşgira demîn –di tê berya rayekê, pêşgira demîn –di tê ber rayekê

ez dibûm mamoste

tu dibûyî mamoste

ew dibû mamoste

em dibûn mamoste

ez diçûm dibistanê

tu diçûyî dibistanê

ew diçû dibistanê

em diçûn dibistanê

ez radibûm ser xwe

tu radibûyî ser xwe

ew radibû ser xwe

em radibûn ser xwe

hûn dibûn mamoste hûn diçûn dibistanê hûn radibûn ser xwe
ew dibûn mamoste ew diçûn dibistanê radibûn ser xwe

a-lêkerên gerguhêz / transitiv Verben

5-Lêkerên bi –an bi dawî dibin:

a- lêkerên negerguhêz /intransitiv verben

man, zan, pan, razan,

tîpa dawîn –n jê tê avêtin û li şûna wê tîpên qertafîn ên kesane tên bici-
hkirin, pêşgira demîn –di tê ber rayekê

ez dimam ez radizam

tu dimayî tu radizayî

ew dima ew radiza

em diman em radizan

hûn diman hûn radizan

ew diman ew radizan

b- lêkerên gerguhêz /transitiv verben

dadan, badan, kolan, dan, radan, kutan, lêdan,

tîpa dawîn –n jê tê avêtin tiştê dimîne rayek e, pêşgira demîn –di tê ber
rayekê

min sobe dadida min lingên xwe radida

te sobe dadida te lingên xwe radida

wî sobe dadida wî lingên xwe radida

wê sobe dadida wê lingên xwe radida

me sobe dadida me lingên xwe radida

we sobe dadida we lingên xwe radida

wan sobe dadida wan lingên xwe radida

me (gelek) sobe dadidan

we (gelek) sobe dadidan

wan (gelek) sobe dadidan

6-Lêkerên bi –tin bi dawî dibin:

a- lêkerên negerguhêz /intransitiv verben

hatin, gihiştin, ketin, nivistin,

paşgira raderî –in tê avêtin û li gorî kesan tê kişandin, pêşgira demîn –di
tê ber rayekê

ez dihatim	diketim
tu dihatî	tu diketî
ew dihat	ew diket
em dihatin	em diketin
hûn dihatin	hûn diketin
ew dihatin	ew diketin

b– lêkerên gerguhêz / transitiv verben

alastin, firotin, avêtin, bihîstin, bijartin, biraştin, cûtin, dîtin, dotin,
gestin, girtin, gotin, guhertin, guhestin, guvaştin, hejmartin, hinartin,
hiştin, jentîn, kuştin, lîst, malaştin, mêtin, pişaftin, parastin, qefaltin,
qeşartin, rêstin, rêtin, rîtin, sotin, şuştin, xistin, xwestin

ji lêkerê paşgira raderî –in tê avêtin, tiştê dimîne rayek e, pêşgira demîn
–di tê ber rayekê.

min dialast	min diavêt
te dialast	te diavêt
wî dialast	wî diavêt
wê dialast	wê diavêt
me dialast	me diavêt
we dialast	we diavêt
wan dialast	wan diavêt

Spartek ji bo demên borî

Rayeka van lêkeran li gorî dema borî binivîsin:

–tin	–în	–ûn	–an	–andin/–endin	–irin/–arin
avêtin	fîrîn	cûn	zan	şandin	xwarin
cûtin	xebitîn	bûn	pan	xwendin	vexwarin
hatin	anîn	rabûn	man	çandin	birin
ketin	danîn	vebûn	dan	kenandin	kirin
dîtin	şewitîn	rê ve cûn	dadan	kelandin	mirin

Bi van lêkerên li jorê û bi peyvên li jêrê hevokan saz bikin

	dema borî ya diyar	dema borî ya ne diyar
kevir	Min keviyek avêt çûkan.	Min keviyek avêtiye çûkan.
benîşt		
ji malê		
ji ser darê		
li ber çem		
bi balefirê		
li kargehê		
ji pirtûkxaneyê		
pirtûk		
destê min ji êgir		
kargehê		
ew sala çûyî		
mêvan		
kulilkên biharê		
keç û kur bi hev re		
bizîna me par		
bi rojan li hêviya te		
ez demekê li gundekî çiyayî		
min hinek pere bi deyn		
dayika te tenûr		
min ji evîna xwe re nameyek		
te pirtûka li ser xwezayê		
kê ev dar li vir		
wî em pir		
wan ji xwe re deh lib hêk		
me şîva êvarî bi hev re		
Ez naxwazim vê avê		
Pisikê çêlika xwe		
Gulê par gelek kar		
Ew ji tiraliyê		

	çirokiya dema borî ya diyar	dema borî ya domdar
kevir	Min kevirek avêtibû çûkan.	Min kevirek diavêt çûkan.
benîşt		
ji malê		
ji ser darê		
li ber çem		
bi balefrê		
li kargehê		
ji pirtûkxaneyê		
pirtûk		
destê min ji êgir		
kargehê		
ew sala çûyî		
mêvan		
kulilkên biharê		
keç û kur bi hev re		
bizina me par		
bi rojan li hêviya te		
ez demekê li gundekî çiyayî		
min hinek pere bi deyn		
dayika te tenûr		
min ji evîna xwe re nameyek		
te pirtûka li ser xwezayê		
kê ev dar li vir		
wî em pîr		
wan ji xwe re deh lib hêk		
me şîva êvarî bi hev re		
Ez naxwazim vê avê		
Pisîkê çêlika xwe		
Gulê par gelek kar		
Ew ji tiraliyê		

Sê berhemên nû ji weşanxaneyê APECê

Jinên kurd di çavkaniyên swêdî de

Jinên kurd di dîrokê de, di folklor û edebiyata kurdî de roleke mezin lîstîne/dilîzin. Di çavkaniyên biyanî de jî gelek tişt di derbarê jinên kurd de hatine weşandin.

Rohat Alaokom di çavkaniyên swêdî de li ser kurd û Kurdîstanê çî hatibe nivîsîn wek lêkolînerê heskirîyê dîroka Kurdîstanê bi hûr û kur lêkolaye.

Çawa tê zanîn bi hezaran jinên kurd ji herçar perçên Kurdîstanê û çîhanê hatine Swêdê û îro li vî welatê Bakûrê dijîn.

Di pirtûkê de serpêhatîyên jinên kurd ên navdar wek Leyla Bedirxan, Leyla Qasim û Emîne, jina Serif Paşa û yên li welêt di medya swêdî de çawa hatine şîrove kirin, çîh digrên.




Lorînên şevê

Enwer Karahan 1962an de li Dêrika Mêrdînê hatiye dunê. 1997an de wek pênaber hat li Swêdê bi çîh û war bû. Demekê redaktoriya kovara *Berbangê* kir. *Lorînên şevê* diwana wî ya helbestan a yekem e.

Graniya motîvên helbestên Enwer Karahan li ser nostaljiyên wek wendakirina warê xwe, jîyana li gund û zaroktiya xwe bi giştî bîranînên bikeser, diltenikîyê, kevneşopî, ewlakarî, hezkirin û jîyana nuha û berê ne.

Berhemên Karahan ên ku heta nuha hatine çapkirin; *Şevbihêrkên şevên xalî*, kurtenovel 2001, *Duaya êvarê*, kurtenovel 2003, *Xanima kozê*, kurtenovel (2005), *Çû ceribandîn* (2006), *Du dilop*, kurtenovel (2008), *Şapînoz*, roman (2010), *Mêlav, vegotin* (2013), *Siwarê şînbozê Êlas Efendî*, roman (2013)



Dîroka Kurdîstanê di çapemenîya swêdî de (Sedsalên 19 û 20an)

Bi saya vê xebatê xwendevanên kurd firsendeke baş dibînin bona nasiya xwe bidin dîroka swêdî jî. Dîroka herdu welatên ku ji hev gelek dûr in, dîroka kurd û swêdiyan belkî jî cara pêşîn e evqas nêzî hev dibin, hew dewlemend û rengîn dikin.

Pirtûkî ji du parên mezin pêk tê. Di van herdu paran de qasî 20 beşan çîh girtiye. Di para yekem de ji nivê yekem yê sedsala 19an heta nivê yekem ê sedsala 20an li ser rewşa Kurdîstanê tê sekinîn, tekoşîn û tevgerên kurd tînan nasandin. Di para duwem de çend beşên li ser çanda kurd û hin mijarên din çîh girtine. Têkiliyên kurd û swêdiyan heta Dewra Vîkingan (sedsalan 10 û 11) dirêj dibin, nişan didin.





Gewrê Özyurt, jina Canbegî, ji Têcira Kurmanca
(Kürttaciri-navê gund ê berê) Özyurt Köyü-Polatli-Ankara
Tarixa li wêne: 12.10.1953